

## Qêrîna bêdeng a aştiyê

Mizgîn Denîz di hilbijartinên herêmî yên 2024an de wek endama meclîsê ya şaredariya Nêsîbînê hat hilbijartin. Navê wê ne tenê nûnertiya siyasî; navê berxwedan, hêvî û rûyê germ ê dayikê bû. Diya Egîd û Elîf bû... *Nalîn Aslan/R-2*



## Du rê li pêşiya me ne

Ev gotinên Numan Kurtulmuş ê serokê Meclîsa Tirkiyeyê ne. Di gera xwe ya Şirnexê de, li Çiyayê Gebarê li ser cihê ku petrol jê derdikeve axivî û di encama gotara xwe ya berfireh de, ev peyvên balkêş ji devê wî derketin... *Ahmet Aktaş/R-8*



## Faşîzm xirabiyeke mutleq e

Di 25ê Nîsana 2025an de, Komara Îtalyayê 80ê saliya rizgarbûna xwe ji dagirkerên Nazî û rejîma faşîst a Mussolini pîroz dike. Di vê rojê de, 80 sal berê, partîzan, endamên Tevgera Berxwedanê, li bajarên bakurê Îtalyayê ku di bin... *Kurdistan Lezgiyeva/ R-7*


26 Gulan - 1 Hezîran 2025
Hejmar: 284
Buha: 20 TL
rojnameyaxwebun@gmail.com

# xwebûn

xwenasîn e




## Bila her kes azad bijî

Gelê kurd bi sedan salan e ku têkoşîna maf û azadiya xwe dide. Bi taybetî jî ev 50 salên dawî ji aliyê Tevgera Azadiya Kurd ve li dijî polîtîkayên tunekirin û tunehesibandinê têkoşîneke siyasî û çektarî tê meşandin. Bi pêşengiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêvajoyek hatiye destpêkirin û li ser banga wî ya "Aştî û Civaka Demokratîk" hêviyên gel û civakan ên aştî, azadî, wekhevî û demokrasiyê yên pêşeroje zêde bûye. Yek ji pîrên civaka elewî û Hevserokê Giştî yê DADê Pîr Zeynel Kete, li ser polîtîkayên li dijî elewiyan, hêvî û bendewariyên wan ên ji vê pêvajoyê axivî. Pîr Zeynel Kete diyar kir ku ew kuştina tu mirov û zindewarî rewa nabînin û napejirînin û got: "Gelê kurd û tirk gelek êş kişandin. Wekî civaka elewî em dixwazin ev xwîn raweste û her kes bi çanda xwe, ziman, nasname û baweriya xwe bijîn..." *Hevpeyvîna Rohat Bulut/R-4*

# Wayûbirayîya huqûqî

Serekê PKK'yî Abdullah Ocalanî dîyar kerd ke zemînê huqûqî de komel hewcedarê peymanêka newe ya komelkî yo. Ey vat ke wa wayûbirayîya tirk û kurdan a ke verê cû xeripîyaye, newe ra bêro awankerdene. Mîyanê se serran de têkilîyanê wirdî şaran zerarêko pîl dî. Tîya de mesuldarîya îdarekaranê dewlete est bîye. Seke zanîyeno serranê verênan ê ronîyayîşê Komara Tirkîya de vera kurdan dişmenîye, bêedaletîye, bêhuqûqîye û nîjadperestîye dest pêkerd. Seba ke mîyanê şaran de hemwelatîya têduşte nêbo, îdarekaranê dewlete her tewr metod xebitna. Serranê 1920an de bingeyê netewe-dewlete erzîyayî. Hemverê estbîyayîşê şarê kurdî polîtîkaya tenkîl, tedîp û temdînî dest pêkerd. Na çarçewa de netewe-dewlete xeylêk qirkerdişî viraştî û kurdî dayî "gîyotinan" ver. Mustafa Kemalî serra 1928î de vatêne ke "komare kesêkê merdimanê bêkesan o". Komare kurdî bêkes veradayî û dima dayî bombayan ver. Yanî kurdan komare ra çi feyde û xêr nêdî. Bi kilmî serranê verênan ê ronîyayîşê Komara Tirkîya de gojagê îşligî xelet erzîyabî. Komare est bîye, la demokrasî çin bî. Nika dem demê sazkerdişê komara demokratîk o. No zî girêdayîyê qanûnê bingeyî yê neweyî yo. Komel êdî hewcedarê qanûnê bingeyî yê demokratîk û azadîwazî yo... *R-9*



## Banga 27ê Sibatê banga sedsalê ye

Kurd 50 sal in li dijî curumkarî û kiryarên faşizan têdikoşin. Gelê kurd, di vî şerê dijwar de dîrok xistine lêpirsînê. Banga Birêz Abdullah Ocalan a 27ê sibatê, encama vê têkoşînê ye û destpêka dadgehkirina dîroka sed salî ye. Di pêvejoya "Aştî û Civaka Demokratîk" de herî zêde nirxandina sosyolog, akademsiyen û hin pedegogan bala min kişandiye. Ji ber ku ew dibêjin, Birêz Abdullah Ocalan hemû termên neo"îst" û yek"îst" red kirine û rewşa xitimî bi dawî kiriye. Dîtina wan a hevpar jî ew e ku banga Birêz Ocalan û biryarên Kongreya 12emîn a PKKê, di aliye zanista civakî û disîplîna dîrokî de giring in û dibêjin; bandoreke mezin li cîhanê kiriye... *R-7*

## Ber bi serdemeke nû ve

Têkoşîna gelê kurd a azadiyê ya ku ji 50 salan zêdetir e berdewam dike, tenê hewldana nasandina nasnameyeke nîjadî nîn e. Di heman demê de rabûna li ser piyan a heqîqetên ku hatibûn bêdengkirin, dîroka ku dihat înkarkirin û vîna gelekî ya ku dihat pêpeskirin e. Ev têkoşîn, qasî ku êş û elem girtine nav xwe, hêviyan jî di nav xwe de dihewîne. Di roja îroyîn de, ev meşa dûr û dirêj gihîştiye qonaxeke gelek girîng. Xuyaye ku êdî serdemek bi dawî dibe û deriyên serdemeke nû ya dîrokî vedibin. Ev daxuyaniya girîng a bi daxwaza "Bangewaziya Aştî û Civaka Demokratîk" a ku di 27ê Sibatê de ji aliye Abdullah Ocalan ve hatibû kirin, bi navbeynkariya Heyeta Îmraliyê jî gihîştibû civakê... *R-8*

## Helbestvanekî bîreweriyê

Çil û pênc salên dawî wek pêlên deryayê kir beşek ji meşa azadiyê ya gel. Di her qonaxê de, wî wek ronahiyekê rê nîşan da, wek rêpîvanekê helwesteke hevpar afirand. Ne tenê bi kirinên xwe, bi ruhê xwe yê ku tu carî nehejiya, bandor kir. Jiyana wî bû dîwaneke helbestî, qada şêwrê bi wateyên kûr tijî kir û her rêzika wî dil bi hestên xweş dijenand. Ne tenê çîrokek, destanek bû; wek straneke ku li ber bayê guhan bilind dibe û di nav dengê çiyayan de ahengeke daîmî dihêle; hebûneke xurt li xwebûna heyî zêde kir. Di şevên herî tarî de, wek stêrkeke birûskdar bû li gel rojê. Di asîmanê dîroka gelê xwe de, çerxa gerdûnê bi ronahiya xwe xemiland û bingeheke zindî ji atmosfera jiyanê re afirand, li gel Mazlûm, Kemal, Egît, Sakîne û bi deh hezaran şopdarên vê rêça pîroz. Tu ne yê dawî bûyî ku rojekê hat û Riza jî li dû te ket rê... *Hogir Berbir / R-5*

## Divê qedexeyan rakin

Dewleta Alman di sala 1993yan de qedexe danîbû ser PKKê. Qedexeya li ser PKKê li pêşiya xebatên ku kurd li Almanyayê dikin dibû asteng. Parêzeran piştî xwefesihkirina PKKê ji bo rakirina qedexeya li ser PKKê di 11 gulana 2022yan de serî li hikûmeta Almanyayê dabûn. Hate ragihandin ku hikûmeta alman bersiva neyînî daye serlêdanê. Hevserokê MAF-DAD Mahmut Şakar, têkildarî serlêdana li dijî qedexeya PKKê nirxandin kir û wiha got: "Gelê kurd ji dervê Tirkiyeyê herî zêde li Almanyayê rastî tundî û zextan tê. Dewleta Alman ji destpêkê de çareseriya pirsgirêka kurd dixe zorê. Hîn ji salên 1980yî de li dijî siyasetmedarên Kurd dest bi binçavkirin û girtinê kir. Bi taybetî di sala 1989an de li Dusseldorfê gelek siyasetmedarên kurd hatin darizandin. Di salên 1990î de ev doz, bû dozeke herî giran a polîtîk a Almanyayê. Çavkaniya herî neyînî ya li dijî meseleya gelê kurd di 22yê mijdara 1993yan de Wezîrê Karên Hundir ê Alman bi Giştînameyekê biryara qedexekirina xebatên PKKê da. Li pişt hemû zextên li ser gelê kurd ev belgeya qedexeya xebatên PKKê heye. Piştî vê giştînameyê Wezîr, li gelek bajarên Almanyayê nêzî 30 komeleyên kurdan hatin girtin. Gelek saziyên kurdan hatin girtin. Ji wê demê heta niha li dijî saziyên kurdan û meseleya kurdan, hewldanên berovajîkirinê pêş xistin"... *R-3*



## Dem dema kurdan e

"Kurdistan mêtingeh e!" Gava ev peyva bi sêhir yekem car li guhan teqiya, di rastiyê de hîmên bingehîn ên xebateke 50 salî jî dihatin avêtin. Serhildana 29an ku di bin serokţiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de wê dest pê bikira, bingeheke nû ya lêgerîna statûya Kurdan a li Rojhilata Navîn bû. Lê ev pirsgirêk ne pirsgirêkeke ji rêzê bû, lêgerîna statûya hezar salî bû. Danûstendina netewedewletan ku ligel modernîteya kapîtalîst tevahiya cîhanê teqandin û nîzama nû ya cîhanê ku ji aliyê pergala ku çêbû ve hat afirandin, derfeta jiyanê nade kurdan. Gava mirov di çarçoveya dîrokî de dinihêre, kurd ku yek ji gelên herî qedîm ên vê erdnîgariyê ne, ji dîroka kevnar heta niha gelek xebat kirine ku rastiya xwe bihebînin û heya roja îro jî hewl dane ku hebûna xwe biparêzin. "Eger sosyalîzmên me yên dused salî jî li kapîtalê asîmîle bûne, belkî jî em nikarin ji nav tayfeya lanetdarên ku dikarin çarenûsa heman ji bîra leşkerên wan îdealên mezin ên mirovahiyê bînin. Ji bilî vê, em nikarin Sokrates, Budha, Zerduşt bêdeng bihêlin û peyvên wan ên dawî hatine gotin tine hesab bikin. Heta ku em wan jiyandar nekin û weke duh ji me re nû neyê, em ê wisa...*R-6*

## Ji hunermendan re mîrateyeke hêja hişt

Rista ji hunermendan ji bo civakên wan girîng e. Kêm hunermend hene ku li gorî rist û bendewariyên civaka xwe tevdigerin. Hunermend Tehsîn Taha jî yek ji wan hunermendan e ku bi têkoşîn, xebat û hunera xwe mîrateyeke giranbûha ji civaka kurd re hiştiye. Bi taybetî jî bi stranên xwe, cih û textekî bilind di dilê civaka xwe de afirandiye. Bêguman wekî her hunermendê li ser doza têkoşîna civaka xwe gelekî êş kêşandiye û bedel daye. Tehsîn Taha di 25ê gulana 1941ê de li bajarê Amêdiyê yê başûrê Kurdistanê ji dayik dibe. Perwerdeya xwe li Mûsil û Bexdayê dibîne. Ji ber karê bavê xwe, bi malbatî bajar bi bajar geriyane. Tehsîn Taha di temenê xwe yê biçûk de muzîkê... *R-11*

## Rûyê xwe xweş dikin

Di dilê Rojhilata Navîn a ku her dem di nava krîzan de ye, jin bi taybet jî jinên kurd li aliyekî li hember hêzên hegemon li aliyê din jî li hember desthilatdariyê ketiye şerê xweîspatkirin û misogerkirina azadiya xwe. Ev yek li Sûriyeyê û di nava desthilata navendî de bi awayekî zelal berbiçav e. Ji dema hatina rêjîma Baas a rûxiyayî li ser desthilatê û heta bi ketina wê, her wiha bi hatina desthilata nû re rola jinan bi awayekî sîstematîk di qadên siyasî, civakî, çandî û hwd. de hatiye paşguhkirin. Felsefeya 'Jin Jiyan Azadî' vê mijarê bi perspektîfa rizgariyê tîne ber çavan... *R-2*

# Bi erkdarkirinên şiklî rûyê xwe xweş dikin

Di Sûriyeya nû de divê mafên jinan di qada pratîkê de were cîbicîkirin û parastin. Nimûneya vê yekê jî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye ku jin di hemû qadên jiyanê de cihê xwe digrin û bi awayekî pratîkî pêşengiyê ji xebatên gelemper re dikin



Lîlav Elî

Di dilê Rojhilata Navîn a ku her dem di nava krîzan de ye, jin bi taybet jî jinên kurd li aliyekî li hember hêzên hegemon li aliyê din jî li hember desthilatdariyê ketine şerê xweîspatkirin û misogerkirina azadiya xwe. Ev yek li Sûriyeyê û di nava desthilata navendî de bi awayekî zelal berbiçav e. Ji dema hatina Rêjîma Baasê ya rûxiyayî li ser desthilatê û heta bi ketina wê, her wiha bi hatina desthilata nû re rola jinan bi awayekî sîstematîk di qadên siyasî, civakî, çandî û hwd. de hatiye paşguhkirin.

Felsefeya 'Jin Jiyan Azadî' vê mijarê bi perspektîfa rizgariyê tîne ber çavan. Ev felsefe ne tenê çareserkirin lê koka kûr a desthilatê û hişmendiya mêr a serdest ji hev dixe. Ev felsefe ku rizgariya jinan e wekî şertê bingehîn ji bo rizgariya civakê dibîne, jiyanê weke qada hevpar a wekheviyê, azadiyê jî weke nirxekî ku nayê parçekirin dibîne.

Bi hatina Rêjîma Baasê ya Sûriyeyê li ser desthilatdariyê û heta roja ketina wê ya di 8ê kanûna 2024an de, vê rêjîmê her tim netewperestî û navendî esas girtiye. Nasnameyên derveyî yên Ereb hemû ji hebûna xwe dihatin dûrxistin û asîmîlekirin. Kurd jî yek ji gelên herî zêde ku rastî vê polîtîkayê hatine. Jinên Kurd ne tenê bûn qurbana polîtîkayên nîjadperest, di heman demê de hem weke jin hem jî wek Kurd ketiye pêvajoyeke paşguhkirinê. Ev paşguhkirin beşdariya jina Kurd a di qada siyasî de dûrxist, cihên ku ji bo wê dihatin diyarkirin jî sembolîk bûn.

Li hember vê desthilatdariya ku civak û jin di nav pencên asîmilasyonê de pêçandibû, felsefeya ku koka xwe jî têkoşîna jinên ku yên li çiyayên azad û bi taybet têkoşîna jinên rojavayî tê, derket pêş û bû dengek ji bo berxwedan û azadiyê. Felsefeyeke ku hebûna mirovahiyê ji nû ve ava dike û jinê weke navenda jiyanê dibîne.




Li rojavayê Kurdistanê bi taybet li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jinan bi şoreşa 19ê Tîrmehê re cewhera felsefeya Jin Jiyan Azadî di nava dilê civakê û her jinek ku hezkiriyê azadiyê ye da rûniştandin. Jin ne tenê mafê beşdariyê bidestxistin di heman demê de bûn rêveberên saziyên siyasî, civakî, aborî, çandî. Herwiha bûn fermandar û artêşa taybet bi jinan (Yekîneyên Parastina Jin-YPJ) ava kirin. YPJ bû sembola berxwedana jinan a li dijî desthilatdarî û xetertirîn terora (DAIŞ) di cîhanê de.

Rêjîma Baasê ya Sûriyeyê rola jinan di çarçoveyeke teng û bêwate de hiştibû. Ev yeka bi hatina HTŞê re ya bi rêveberiya 'Colanî' re dewam dike. Ji wê zêdetir jî ji cihên biryargirtinê dûr hatin xistin. HTŞ bi fikra xwe ya îslamîst û radîkal li tevahiya Sûriyeyê bi kiryarên xwe belav bû. Her wiha bi xwe re têgehên nû jî anîn; bi taybet jî li ser jinan. Ji destpêka hatina wan û heta niha gelek kiryar, daxuyanî û biryar li ser jinan girtin. Li aliyekî din serçete Ebû Hatim El Şeqra ku siyasetmedara Kurd Hevrîn Xelef şehîd xistibû, cihê xwe di rêveberiya Sûriyeyê de girt. Li şûna ku ew û kesên pê re li dadgehên navneteweyî werin darizandin û hesab ji wan bê pirsîn, îro li Sûriyeyê xwe weke rêveber pêşkêş dikin.

Desthilata Şamê qaşo ku xwe weke parêzvanê mafên jinan dide diyarkirin, lê di rastiyê de ne wiha ye. Di van demên dawiyê de hejmarek jin weke di postên rêveberiyê de cih dane wan, wiha dane nîşankirin, lê piştre derket holê ku ew tenê ji bo berjewendî û ajendeyên xwe xistine kar. Tenê hejmareke biçûk ya jinên nêzî xwe erkdarkirin, da ku bi rêya wê nîşan bidin ku cih dane jinan.

Li aliyekî cihên sembolîk û şiklî didin jinan, li aliyê din jî di zanîngeh û dibistanan de nixumandina porê jinan û lixwekirina cilên reş li jinan tê ferzkirin. Hewldanên sîstematîk ên ku rola jinan ji cewherê wê dûr bixin û veguherînin amûreke di bin destê rêjîma desthilatdar de. Bi vî rengî temsîliyeta jinan dibe maskeyeke derewîn. Ji bo tepsandina zilm û polîtîkayên înkarkirina hebûna jinan tê bikaranîn. Ev şêwazê erkdarkirinê ji bo jinan serkeftinekê nîşan nade, berovajî wê kedxwariya sembola ji bo domandina sîstema baviksalariyê bi xwe ye.

Lewra di Sûriyeya nû de divê mafên jinan di qada pratîkê de were cîbicîkirin û parastin. Nimûneya vê yekê jî Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye ku jin di hemû qadên jiyanê de cihê xwe digrin û bi awayekî pratîkî pêşengiyê ji xebatên gelemper re dikin. Divê tecrûbeya Rêveberiya Xweser a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê were serwerkirin û jin ne wekî şiklî lê belê jin bi cewher û nasnameya xwe rengê xwe di Sûriyeya nû de xêz bikin.



## Banga azadiyê ji dîrokê re

Rolyana Ahmed

Ji çar navendên binçavkirinê û zindanan bigire heta dîroka derewîn a rastiyê, dema nivîsandina dîroka rastiyê ye. Dem hatiye ku dîrok derewên rastiyan kifş bike û rastiya zarokan nû ve binivisînê ku ji bo guhertina bûyerên dîrokê ji dayik bûye. Wî wek serhildêrekî dest pê kir, hemû têgînên jiyanê yên dîl ên rengên xapandinê yên ku têgehên azadiya sînorkirî xemilandin red kir.

Ew zarokê nû ji bo sererastkirina rêya jiyanê û vegerandina rûmeta azadiyê ji dayik bû. Lewma li ber dîrokê bi qîrîna zayînê dest pê kir û bi qîrînên xwe got, "Rastiyan ji nû ve rêz bikin û ji sêgoşeya Zîgurata Sumeran û modernîteya kapîtalîst xwe bigihînin da ku li gorî modernîteya demokratîk hûn bimeşin. Derewtiya we derket holê."

Û rastiyên ku li ber deriyên tarîtiya we kom bûne, hêviyên wê zarokê nû yê ku meşaleya azadiyê û pirtûka azadiya neteweya demokratîk hildigire bi xwe re hilbigire.

Em bi wê bangê mezin dibin. Têkoşîn û bar girantir dibe. Herwiha bi berdewamkirina deng û çîrokên qehreman û cangoriyên vê dozê ku kêlî bi kêlî em pê re jî mezin bûn, kesên ku vî dengê û wan çîrokên lehengiyê û pirtûkên azadiyê bilindkirin û nivîsandin ew têkoşer û biryardarên wê bangê û wê dozê ne.

Belê ji dîroka sexte û tarî ya rastiyê bigre heta kesayetên ku li pey heqîqetê dimeşin û dixwazin wê dîroka derewîn a rastiyê veguherînin û derewtiya wê dîrokê yê ku ji diziya berhemên jinên xwedawend heta modernîteya kapîtalîst hatiye nivîsandin sererast bikin. Bi rengê neteweya demokratîk û paradîgmaya azadiyê, rêya jiyanê ku bi rûmet û vegera li dayikê be. Hatina PKKê ji tevahî netewên bindest re wek mûcîzeyekê bû, lewma bi qêrînên azadiyê li pêşberî dîrokê û wan têgînên sexte gotin "Em ji bo aştî û demkorasiyê her tim têdikoşin û em ê têbikoşin."

Têkoşîna wan bingeha xwe ji banga Rêberê gelan digre. Banga ku ji destpêka zayîna mirovahiyê heta kêliya niha li hember her cureyên asimilasyon, qirkirin û bêdengkirina dengê heqîqetê li dijî têgînên sexte yên jiyanê derket. Têkoşîna wan ne tenê li Kurdistanê li tevahî cihanê deng veda.

Belê ew zarokê ku azadiyê bi navê wî re dest pê kir, gihîşt tevahî cihanê û bû rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan. Zayîna wî bû bingehê zayîna azadiyê ku hê jî bi navê wî berdewam dike.

Rêber Abdullah Ocalan insiyatîfa pêvajoya aştî û demokrasiyê girt destê xwe. Ew xwedî alternatîfa herî xurt e. Pêvajoya ku destpêkiriye dê bibe dermanê hemû aloziyên li Rojhilata Navîn.

# Qêrîna bêdeng a aştiyê: Dayika Mizgîn



Nalîn Aslan

Mizgîn Denîz di hilbijartinên herêmî yên 2024an de wek endama meclîsa şaredariya Nêsibînê hat hilbijartin. Navê wê ne tenê nûnertiya siyasî; navê berxwedan, hêvî û rûyê germ ê dayikê bû.

Diya Egîd û Elîfê bû. Egîd navê şervanekî ku li vî welatî dihat naskirin bû. Egîd navê xwe li ser rêya kesên ku bi xewna azadiyê ber bi çiyayan ve dimeşiyan nivîsî. Li aliyê din Elîf niha di girtîgehê de, di navbera çar dîwaran de ye. Dayika Mizgîn kenên zarokên xwe yên neqediyayî di çavên xwe de digirt. Bi salan baweriya xwe ya bi aştiyê winda nekir. Dema ku her kes bêdeng bû axivî; dema ku her kes diwestiya dimeşiya. Duayên wê ji bo aştiyê, ji bo siberojên ku zarok nemirin û dayik negirîn bûn.

Û êvarekê... Di wan saetan de dema ku roj li pişt çiyayan diçû û kolanên Nisêbînê hênik dibûn, êşek hat ber deriyê me. Dayika Mizgîn danê êvarê dema ji kolanê derbas dibû qeza derbas kir, li cihê bûyerê jiyana xwe ji dest da. Wê gavê ne tenê kesek, hêviyek, bîranînek ji dil jî ji vî bajarî derket. Dayika Mizgîn çû...

Piştî wê, bêdengiya ku bi hêstiran şîn bû li taxê ket. Her kes bêdeng ma. Ji ber ku çûyîna wê ne tenê qezayeke trafîkê bû, lê şikandina destên dayikekê bû ku digihêje aştiyê. Ew destên ku bi salan ji me hemûyan re dua dikirin, ew çav çavên ku bi nebûna Elîf û bêdawîtiya Egîd re sebir dikirin bûn. Ew dil dilê dayikekê bû ku tevî her tiştî jiyan û bawerî berdewam dikir.

Niha Dayika Mizgîn êdî ne li vê dinyayê ye, lê ew ê her dem di bîranîn û duayên me de be. Navê wê dê di her banga aştiyê de ku dê li kolanên Nisebînê were bibîranîn, deng bide. Li salona civînê, di meclîsa jinan de, di hêsirên dayikekê de... Ew ê her dem li wir be.

Vê axê ew wek dayikekê nas dikir, lê ew jî wek mamosteyekê bû. Wê hînî sebr, dilovanî, dadmendî dikir. Nebûna wê ne tenê valahiyek e, di vê civakê de kêmasiyek e. Ji ber ku Mizgîn Denîz dayika me hemûyan bû. Ew jinek bû ku di dilê me de bi dilovaniya xwe, bi qîrîna bêdengiya xwe û bi helwesta xwe ya rast ve hatibû xemilandin.

Piştî Dayika Mizgîn, erka me ew e ku em rêwîtiya aştiyê ya ku dest pê kiriye bidomînin. Divê em bi navê wê bêtir aştiyê bixwazîn û bi xeyalên wê van rêyên tarî ronî bikin. Em ê di her hêsirekê de, di her bêdengiyê de duayên wê bibihîzin. Ji ber ku dilê wê wijdanê hevpar ê vî gelî bû.

Îro dayik dîsa êşa herî kûr his dikin. Dayikên ku bi salan e bi hesreta zarokên xwe dişewitin, bawer dikin ku aştî wê rojekê li derî bixe. Dayik di vê pêvajoyê de yên herî westiyabûn, lê yên herî hêja bûn. Li hemberî mirinê jî jiyan parastin û di her şînê de aştî mezin kirin. Dayika Mizgîn yek ji wan dayikan bû.

Niha, piştî wê, deynekî me yê din heye: Ne bes e ku em tenê aştiyê bixwazin, pêdivî ye ku em wê ava bikin û di rêza herî pêş a vê avakirinê de divê dayikên ku herî zêde rêz, edalet, herî zêde aştî heq dikin bin. Ji ber ku ew herî zêde giriyan, lê dîsa jî herî zêde bawer kirin.

Oxir be, cîhê te bihuşt be Dayika Mizgîn. Tu ji dayikekê wêdetir bûyî, em te ji bîr nakin.

*Diya Egîd, hesreta Elîfê*
*Te herî zêde bi aştiyê bawer dikir.*
*Û em bawermendên wê baweriyê ne.*



# Piştî biryara PKKê divê qedexeyan rakin


## Hevserokê MAF-DADê Mahmut Şakar bal kişand ser helwesta Almanyayê û got: "Bi taybetî piştî pêvajoya ku di Cotmehê de li Tirkiyeyê dest pê kiriye, helwesta Almanyayê li dijî saziyan bêtir hişk bûye û zext zêde kirine

Yilmaz Yilmaz

Parêzeran ji bo rakirina qedexeya PKKê di 11yê Gulana 2022yan de serî li hikûmeta Almanyayê dabûn. Hate ragihandin ku hikûmetê bersiva neyînî daye. Li Bundespresskonferenza li Berlînê MAF-DAD û Civaka Azad di 21ê Gulanê de li Berlînê têkildarî qedexeya li ser PKKê daxuyanî da.

Dewleta Alman di sala 1993yan de qedexe danîbû ser PKKê. Seroka Desteya Rêveberiya MAF-DADê Parêzer Heike Geisweidê moderatoriya konferansa çapemeniyê kir û Parêzer Lukas Theune di sala 2022yan de ji bo rakirina qedexeya li ser PKKê serlêdan kiribû.

Hevserokê MAF-DADê Mahmut Şakar, têkildarî serlêdana li dijî qedexeya PKKê nirxandin kir û wiha got: "Gelê Kurd ji derveyî Tirkiyeyê herî zêde li Almanyayê rastî tundî û zextan tê. Dewleta Alman ji destpêkê ve çareseriya pirsgirêka Kurd dixe zorê. Hîn di salên 1980yî de li dijî siyasetmedarên Kurd dest bi binçavkirin û girtinê kir. Bi taybetî di sala 1989an de li Dusseldorfê gelek siyasetmedarên Kurd hatin darizandin. Di salên 1990î de ev doz bû dozeke herî giran a polîtîk a Almanyayê. Çavkaniya herî neyînî ya li dijî meseleya gelê Kurd di 22ê Mijdara 1993an de Wezareta Karên Hundir a Almanyayê bi Giştînameyekê biryara qedexekirina xebatên PKKê da. Li pişt hemû zextên li ser gelê Kurd ev belgeya qedexeya xebatên PKKê heye. Piştî vê giştînameya Wezaretê, li gelek bajarên Almanyayê nêzî 30 komeleyên Kurdan hatin girtin. Gelek saziyên Kurdan hatin girtin. Ji wê demê heta niha li dijî saziyên Kurdan û meseleya Kurdan, hewldanên berovajîkirinê pêş xistin. Vê krîmînalîzasyonê piştgirî da şerê Tirkiyeyê yê li dijî Kurdan. Biryara Wezîre Karên Hundir a qedexeya xebatên PKKê, di heman demê de rastî pêvajoya ku li Kurdistanê şerê Kontir Gerîla yê li dijî Kurdan di asta herî jor de bûye, tê. Bi vê biryarê xwestin çalakiyên gelê Kurd ên li dijî vî şerê li Kurdistanê asteng bike û nehêle ku ev şer bibe rojeva cîhanê."



**Qedexeyên li ser Kurdan didomin**

Mahmut Şakar da zanîn ku yek ji piyê Konsepta Navneteweyî ya êrîşan a li dijî Kurdan jî ev qedexeya PKKê bû û wiha berdewam kir: "Ji sala 1993an heta niha ev qedexeya li ser Kurdan sal bi sal kûr kirin û mezin kirin. Li diji van qedexeyan heta îro gelek hewldanên hiqûqî pêş ketin. Di demeke nêz de wekî MAF-DADê parêzeran dozeke bingehîn vekir. Parêzerên MAF-DADê di 11ê Gulana 2022an de li ser navê Duran Kalkan û Murat Karayilan daxwaznameya îtîrazê da Wezareta Karên Hundir a Almanyayê. Di vê daxwaznameyê de xwest qedexeya ku ji sala 1993an heta niha didome bê rakirin. Diyar kirin ku vê qedexe rê li pêşiya çareseriya pirsa Kurd digire. Destnîşan kir ku şertên wê demê pir derbas bûne. Me rapora kesê pispor pêşkêşî Wezîrê Karên Hundir kir."

**Me serî li dadgehê da**

Mahmut Şakar bal kişand ser biryara wezaretê û wiha pêde çû: "Wezaretê piştî demeke dirêj û lêkolîneke dirêj di 22ê Gulana 2024an de bersiva redkirinê da me parêzeran. Destnîşan kir ku divê qedexeya li ser PKKê bidome. Piştî vê bersivê parêzeran parêznameyek amade kirin û serî li Dadgeha Îdarî ya Berlînê dan. Li dijî biryara Wezîrê Karên Hundir serlêdana îtîrazê kirin. Doza îdarî vekirin. Şertên vekirina vê doza îdarî jî giring e. Di Cotmeha 2024an de li Tirkiyeyê pêvajoya diyalogê dest pê kiriye. Ev serlêdana parêzeran rastî vê pêvajoyê hat. Dîsa PKKê encama kongreya xwe di 12ê Gulanê de bi raya giştî re parve kir. Diyar kir ku şert û mercên hiqûqî û siyasî pêk bên xwe fesix dike û dawî li çekan tîne. Vê biryarê bi qasî di raya giştî ya Tirkiyeyê de, di qada navneteweyî de jî zêde deng veda."

**Me xwest qedexe bi dawi bibin**

Mahmut Şakar bal kişand ser civîna 21ê Gulanê ya li Berlînê û wiha berdewam kir: "Bi vê civîna çapemeniyê me doza ku li dijî biryara Wezareta Karên Hundir, li Dadgeha Îdarî ya Berlînê vekiriye bi raya giştî re parve kir. Me xwest qedexeyên li ser xebat û rêxistinkirina Kurdan bên rakirin. Vê biryara berdana çekan û pêşxistina siyaseta demokratîk; ji bo rakirina qedexeyê şertên pir baş ava kir. Êdî piştî vê biryara PKKê tu wate û mantiqa vê qedexeyê nema ye. Me hem vekirina dozê bi raya giştî re parve kir û hem jî naveroka parastinê parve kir. Me diyar kir ku piştî biryara 12mîn Kongreya PKKê pêwist e biryara qedexeyê bê rakirin."

Mahmut Şakar anî ziman ku di vê pêvajoyê de yek ji welatê biryara PKKê erênî dît dewleta Alman bû û wiha lê zêde kir: "Fesixkirina PKKê û berdana çekan erênî dît. Eger helwestek wan a wisa hebe, wê demê divê vê qedexeyê jî li ser saziyên Kurdan rakin. Me diyar kir ku bi rakirina qedexeyê dê karibin piştgiriyê bidin pêvajoya çareseriya demokratîk a pirsgirêkê. Me ani ziman ku di qada navneteweyî de jî şert û mercên erênî pêş ketine.

**Zextên li ser Kurdan didomin**

Hevserokê MAF-DADê Mahmut Şakar herî dawi da zanîn ku bi taybetî piştî pêvajoya ku di Cotmehê de li Tirkiyeyê dest pê kiriye, helwesta dewleta Almanyayê li dijî saziyan bêtir hişk bûye. 3 siyasetmedarên Kurd hatin binçavkirin û girtin. Di ser 4-5 komeleyên Kurdan de girtin. Di ser malan de girtin. Em dibînin ku nêzîkatiya dewleta Alman a li dijî Kurdan hişk bûye. Li aliyekî daxuyaniyên erênî didin, li aliyê din helwesteke hişk nîşan didin. Herî dawî di 20ê Gulanê de siyasetmedarê Kurd ku her kes wî nas dike Yuksel Koç binçav kirin û girtin. Ev mudaxaleyeke pir neyînî ya li dijî pêvajoya çareseriyê ye. Ev doza me vekiriye hem ji bo piştgiriyê bide pêvajoya çareserî û aştiyê û hem jî ji bo Almanya helwesta xwe nerm bike firsendeke muhîm e. Me serî li dadgehê da û me parastina xwe da dadgehê. Ji niha û şûnde em ê li benda biryara Dadgeha Îdarî bin. Em ê pêvajoya hiqûqî bidomînin. Li gorî geşedanan em ê gavên hiqûqî bavêjin. Lê divî siyaseta Almanyayê ya li diji vê meseleyê bê guhertin. Em bawer dikin ku doz erênî bi encam bibe dê piştgiriyeke mezin bide pêvajoyê."

# Şer herî zêde bandorê li jinê dike

Mehmet Alî Ertaş

Endama Înîsiyatifa Yekîtiya Neteweyî ya Jinên Kurd a li Ewropayê Havîn Kîyeyê anî ziman ku herî zêde jin ji şer bi bandor bûne û bi înîsiyatîfê armanc dikin ku yekîtiya xwe xurt bikin û nexşerêyekê daynin pêşiya xwe. Havîn Kîye da zanîn ku ji bo wan yekîtiya jinan hebûn e û ji ber vê yekê pir girîng e.

Jinên Kurd hem li çar aliyê Kurdistanê û hem jî li Ewropayê xwe bi rêxistin dikin. Jinên Kurd ên li Ewropayê ku ji çar aliyên Kurdistanê hatine, di salvegera 51emîn a şehadeta Leyla Qasim de kom bûn û Înîsiyatifa Yekîtiya Neteweyî ya Jinên Kurd a Ewropayê ragihandin. Endama Înîsiyatifa Yekîtiya Neteweyî ya Jinên Kurd a li Ewropayê Havîn Kîye, têkildarî armanca înîsiyatîfê û xebatê wê ji Xwebûnê re axivî.

Endama Înîsiyatîfê Havîn Kîye ku di heman demê de li Fransayê xwendekara beşa Antropolojiyê ye, ewil li ser armanca înîsiyatîfê rawestiya û wiha got: "Armanc yekîtiya neteweyî ya jinên Kurd a li Ewropayê ye. Ewil me xwest jinên Kurd ên li Ewropayê li hev kom bibin. Kurd di sedsala 20emîn de hatin parçekirin. Vê parçebûna erdnîgariyê bi xwe re parçebûna bîrdozî, çandî, zimanî û civakî ava kir. Ji ber Kurd parçebûyî bûn, her çiqas xwestin kom bibin jî, ji ber parçebûnê nekaribûn sînoran derbas bikin û kom bibin. Lê niha ji bo yekîtiya xwe ava bikin gelek derfet hene. Ev parçebûn berpirsiyariyekê dide ser milê hemû Kurdan ku em ji bo yekîtiya neteweyî kom bibin. Ev parçebûn li me farz dike ku em di aliyê civakî, jin, siyaset û pêkhateyên din de kom bibin."

Havîn Kîyeyê da zanîn ku berê Platforma Neteweyî ya Jinên Kurd hat avakirin û wiha berdewam kir: "Li Silêmaniyeyê Kongreya Koalîsyona Jinên Demokratîk a Herêmî ya Rojhilata Navîn û Bakurê Efrîqayê (NADA) pêk hat. Me jî li Ewropayê pêwistî bi avakirina înîsiyatîfê dît. Heta niha gelek xebat hatibûn kirin. Di 2017yan de di pêşengiya KNKê de komxebat hatibû lidarxistin. Lê rewşa heyî gelek caran rê li pêş vê yekê girtibû."

**Ji ber şer koçber bûn**

Havîn Kîyeyê bal kişand ser bandora şerê li Kurdistanê û koçberiya ku di encama şer de pêş ketiye û wiha pêde çû: "Kurd ji ber şerê heyî û dijminantiya dewletê mecbûr man ku bi darê zorê ji axa xwe û malbatên xwe dûr bikevin. Ev polîtîkayên tundtiyê yên li ser gelê Kurd dibe sedem ku Kurd koçber bibin û cihê koçî wê dikin jî pirsgirêkan bijîn. Em dibînin ku ji ber şer dawî li van pirsgirêkan nayê. Dîsa ji ber rewşa Kurdistanê her tiştî li ber çavan e. Di şer de yê herî zêde zerarê dibînin jin in. Li hemberî vê yekê dîsa yên li ber xwe didin jin in. Berxwedana jinan a li dijî vî şerî û koçberiyê dîsa li ber çavan e. Lê parçebûyî ye. Çima parçebûyî ye. Em hemû ji parçeyên Kurdistanê yên cuda hatine Ewropayê. Bivê nevê me li her parçeyekî serbixwe xwe bi rêxistin kir û em bûn xwedî bîrdozî. Me xwe li saziyan xwe bi rêxistin kir û em heta îro hatin. Li Ewropayê êdî nabe em vê parçebûnê bidomînin. Li Ewropayê derfet hene. Eger derfet hebin çima em neyên cem hev. Çima em sînorên heyî ji holê ranekin. Çima em piştgiriyê nedin hev. Ewropa vî aliyê neyînî yê Kurdistanê ji holê radike. Em dikarin bi fikr û baweriyên xwe yên cuda bên cem hev û van sînoran rakin. Ji ber parçebûna berê em dibînin ku em zêde ji derd û pirsgirêkên hev fêm nakin. Zêde haya me ji hev nîn e. Ev kêmasiyeke mezin e. Ji ber em sed sal in parçe bûne û em ji hev qut bûne. Em nikarin zêde ji hev fêm bikin. Jinên koçî vir bûne her tim di bin serdestiya dewletên din de hewldana bijîn. Jinên din hewldana xebatên xwe didin. Gelek jin ji ber hişmendiyên cuda hatine vir. Li çar parçeyên Kurdistanê ji ber desthilatiya netewedewletan ji hemû mafê xwe bêpar in. Gelek jin ji ber van polîtîkayan berê xwe didin Ewropayê. Dema koçî Ewropayê dibin, ji hemû çavkaniyên jiyanê qut dibin. Dema tên Ewropayê zêde hev nas nakin u fêm nakin. Ji ber zaravayê kurmancî, soranî û kirmanckî zêde hev fêm nakin. Dîsa her kes dikeve derdê jiyana xwe ya rojane. Ev dibe sedem ku jin zêde nikaribin li hev kom bibin. Ji ber van pirsgirêkan gelek pirsgirêkên jinan nayên dîtin."

**Pirsgirêk şênber kirin**


Havîn Kîye li ser xebatên înîsiyatîfê yên heta niha jî rawestiya û got: "Cara ewil em di 12yê Gulanê de li hev kom bûn. Beriya ku em kom bibin her tim li ser axaftinan gav dihat avêtin. Lê piştî li Rojava û pişt re li Başûr konferans pêk hatin, me biryar da ku em kom bibin. Ji bo em xwe xurt bikin û piştgriya Kurdistanê bikin, me dîrok diyar kir û em kom bûn. Me xwe gihand gelek jinan û me li Kolnê civîn pêk anî. Cara ewil em li hev kom bûn û me rû bi rû qala pirsgirêkên herêma xwe kirin. Me pirsgirêkên xwe bêtir dîtin. Me pirsgirêk şênber kirin û ji bo çareseriya wan me niqaş kir."

Havîn Kîyeyê da zanîn ku wan ewil xwest înîsiyatîfa xwe ragihînin û pişt re karibin bêtir xwe bigihînin zêdetir jinan û jinan bêtir di bin sîwanê de kom bikin.

**Dê 2 mehên din disa kom bibin**

Havîn Kîyeyê anî ziman ku dê 2 mehên din dîsa li Kolnê bi hejmareke mezintir kom bibin û got: "Eger em dîsa kom nebin, em ê ji pirsgirêkên jinên din haydar nebin. Em ê pirsgirêkên heyî tevan bikin rapor. Jinên her parçeyên Kurdistanê xwe digihînin jinên ku ji parçeyê wê koç bûne. Her jin xwe digihînin jinên parçeyên xwe. Piştî komxebata duyemîn em ê konferansê pêk bînin. Piştî komxebata duyemîn dê nexşerêya me bêtir zelal bibe. Gava ewil ew e ku em ji hev haydar bibin û pişt re em nexşerêyekê daynin pêş xwe. Di 2 mehan de em ê xwe bigînin hemû jinan û di bin sîwanekî de kom bikin. Em ê bi rêya bername û medyaya dîjîtal em xebatên xwe berdewam dikin. Em dixwazin jin bêtir ji vê xebatê haydar bibin. Heta Komxebatê em ê bi jinên parçeyên din re civînên online pêk bînin. Em ê ewil xwe di nava xwe de bi rêxistin bikin û kom bikin. Ji xeynî piştgiriya jinên Kurd, em hewl didin ku piştgiriya jinên Enternasyonalîst jî bigirin. Em dixwazin ji tecrubeyên wan jî sûde bigirin. Tecrubeyên wan ji bo me gelek muhîm in. Pêdiviya me bi tecrubeyên wan jî heye."

Havîn Kîyeyê herî dawiyê destnîşan kir ku yekîtî ji bo wan hebûn e û ji bo hebûna xwe biparêzin dê yekîtiya xwe xurt bikin.



## PÎR ZEYNEL KETE: GELÊ KURD Û TIRK GELEK ÊŞ KIŞANDIN

# Bila her kes bi çand û baweriya xwe bijî

Rohat Bulut

*Li Kurdistanê gelê Kurd bi sedan salan e têkoşîna maf û azadiya xwe dide. Ji bo bi çand, nasname û baweriya xwe bijî li ber xwe dide. Bi taybetî jî ev 50 salên dawî ji aliyê Tevgera Azadiya Kurd ve li dijî polîtîkayên tunekirin û tunehesibandinê têkoşîneke siyasî û çekdarî tê meşandin. Di encama ked, bedel û têkoşîna bi dehan salan îro li Kurdistan, Tirkiye, Rojhilata Navîn û mirov dikare bêje li tevahiya Cîhanê pêşengên vê têkoşînê Abdullah Ocalan û PKK di rojeva her kesî de ne. Bi pêşengiya Ocalan pêvajoyek hatiye destpêkirin û li ser banga wî ya "Aştî û Civaka Demokratîk" hêviyên gel û civakan ên aştî, azadî, wekhevî û demokrasiyê yên pêşerojê zêde bûne. Bi sedan salan e ku wekî gel û civak Kurdên Elewî bi polîtîkayên tundrew ên dewlet û desthilatiyan yên red, înkar û bişavtinê re rû bi rû ne. Hêvî û armanc dikin ku bi vê pêvajoyê li ser çand û baweriya xwe bijîn.*

*Yek ji pîrên civaka Elewî û Hevserokê Giştî yê DADê (Komeleya Elewiyên Demokratîk) Pîr Zeynel Kete, li ser polîtîkayên li dijî Elewiyan, hêvî û bendewariyên wan ên ji vê pêvajoyê ji Rojnameya Xwebûnê re axivî .*

*Pîr Zeynel Kete wiha pirsên me bersivand:*



Hevserokê DADê Pîr Zeynel Kete diyar kir ku ew kuştina tu mirov û zindewarî rewa nabînin û wiha got: "Gelê Kurd û Tirk gelek êş kişandin. Wekî civaka Elewî em dixwazin ev xwîn raweste û her kes bi çand, ziman, nasname û baweriya xwe bijîn."

***Em te nas bikin gelo jiyaneke te ya çawa heye û wekî yek ji pîrê baweriya Elewiyan tu bi çi kar û xebatî re mijûl î?***

Ez ji gundê Tanzê yê Perteka Dêrsimê me. Ji malbateke ku di Komkujiya Dêrsimê re derbas bûye me. Bi rûmeta pîr û derwêşên Dêrsimê mezin bûm û di heman demê de yek ji pîrîn Elewiyan im. Bi çand û baweriya Elewîtiyê dijîm. Bi xwendin, lêkolîn û nivîsandinê re mijûlim. Ji bo parastina baweriya Elewiyan, jiyan û bîra civakî û parastina nirxên demokratîk bi salan e ku lêkolînê dikim û dinivîsim. Derbarê pêşketina çand û baweriya Elewiyan, li ser pirsgirêkên civaka Elewî, li ser gelê Kurd û rola wan a di siyaseta demokratîk de, di kovar û rojanmeyên wekî Yenî Yaşam, Yenî Ozgur Polîtîka, Peyîk û Kovara Semahê de dinivîsim. Her wiha ez endamê lijneya weşanê û berpirsyariya karê nivîsê ya Kovara Zulfîkar im. Di vê kovarê de jî ez nivîsên xwe dinivîsim. Bi taybetî jî li ser hevpeymanîya demokratîk a baweriya Elewiyan, nirxên komînal, rêbaza azadiya jinan û ekolojîya civaka Elewî, çand û baweî, dîrok û mitolojîya wan û xeta berxwedana çandî ya Elewiyan. Di heman demê de ez Hevserokatiya Komleya Demokratîk a Elewiyan DADê dikim.

***Polîtîkayên li ser çand, ziman û baweriya Elewîtiyê tu çawa dinirxînin?***

Çand, ziman û bawerî ev sê bingehên heyî yên civaka me ne. Wekî bi dehan gel û civakên li ser vê axê em jî bi awayekî dijwar bi polîtîkayên helandinê re rû bi rû mane û dimînin. Ev sed sale ku bi giştî li ser Elewiyan û bi taybetî jî li ser Elewiyên Dêrsimê polîtîkayeke taybet tê meşandin. Em jî wekî bawermendên vê civaka Elewî hewil didin ku civaka xwe ji van polîtîkayan biparêzin. Wekî DAD em polîtîkayên xwe li ser nasîn, parastin û xwedîkirina çand, ziman û baweriya civaka Elewîtiyê pêş dixin. Bi zimanê Kurdî (bi taybetî zaravayê zazakî yê li Dêrsimê), edebiyata Elewîtî û pîrtiyê hêmanên pîroz in. Divê siyaseta herêmî û dewletî nasnameya Elewiyan bi erênî û fermî nas bike. Em dixwazin ku ziman, çand û baweriyên me were parastin û di heman demê de bibe beşeke aktîf a rêxistinê û lêhûrbûnê.

***Ji bo dawîkirina polîtîkayên red û înkarê bi pêşengiya Abdullah Ocalan û PKKê zêdeyî 50î salan e têkoşînek heye. Tu vê têkoşînê çawa dinirxînin?***

Rast e, li dijî polîtîkayên red û înkarê, bi taybetî jî li dijî polîtîkyên qirkirana çand, ziman û baweriya gel û civakan têkoşîneke demdirêj heye. Belê di nav dîroka siyaseta neteweyî ya di navbera Kurd û Tirkan de, geşedanên girîng pêş ketine. Komarê hebûna xwe li ser redkirina jiyana herêmî, ziman û çanda Kurdan ava kir. Ev bû sedema raperîn û serhilanan. Ji avabûna Komara Tirkiyeyê heta niha bi sedhezaran mirov hatin kuştin û jiyan xwe ji dest dan. Wekî bawerî jî em kuştina tu mirov û zindewaran rewa nabînin û napejirînin. Gelek êş hatin kişandin. Hem gelê Kurd û hem jî gelê Tirk gelek êş kişandin. Wekî civaka Elewî em dixwazin ev xwîn raweste û her kes bi çanda xwe, ziman, nasname û baweriya xwe bijî. Belê îro ev rewş di bin gotina "Aşîtî û Civaka Demokratîk" a Birêz Abdullah Ocalan de tê guhertin. Di heman demê de biryara PKKê girîng e. Em vê bang aştiyê gelekî bi rûmet dibînin û di vê pêvajoyê de em bawerin ku zelalbûn, rastbûn û hewldana civaka demokratîk dê bi ser bikeve.

***Wekî Komeleya Elewiyên Demokratîk (DAD) hûn pêvajoya heyî çawa dibînin?***

Em vê pêvajoyê wekî firsetekê dîrokî dibînin. Divê bi baldarî pêş bikeve lê bi dereng jî nekeve. Aştî ji bo gelan, civak û baweriyan gelekî girîng e. Ev pêvajo ji bo me hemûyan jiyanî ye. Her wiha em di wê baweriyê de ne ku bi pêşketina aştî û demokratîkbûna Tirkiyeyê dê her kes bi hebûn û mafên xwe bijîn. Her kes dê ji serkeftina vê pêvajoyê sûdê werbigire. Lê di haman demê de em dibêjin ji bo ev pêvajo bibe pêvajoya demokrasî û aştiyê divê civak û bewriyên din jî tev lê bibin. Bi taybetî jî wekî Elewî, Êzidî, Ermenî û hwd. Divê bi dawîya pilîtîkayên red û înkarê were û guh bidin daxwazên hemû beşên civakê.

***Ji bo civaka Elewî girîngiya vê pêvajoyê çi ye?***

Wekî ku me anî ziman bi sedan salan e ku li ser Elewiyan polîtîkayeke tunekirin û tunehesibandinê heye. Bi taybetî jî di warê baweriyê de her tim hatiye armanckirin ku baweriya Elewîtiyê ji holê rakin. Xwestin ku wekî mezhebekî Îslamiyetê nîşan bidin û di nav Îslamiyetê de bihelînin. Dema em lê dinêrin heta astekê jî bi ser ketine. Bi taybetî Elewiyên, Dêrsim, Mereş, Sêwas û Amedê, hatine bêdengkirin. Elewî di komkujiyan re derbs bûne. Wekî mînak; Mereş, Çorûm, Sêwas, Gazî û hwd. Lê her tim me aştî û wekhevî parastiye. Hem her tim li cem derdorên azadîxwaz, demokratîk, aştî û wekhevîxaz cihê xwe girtiye. Lewre jî em gelekî girîngiyê didin vê pêvajoyê. Ev pêvajoya aştiyê dikare bibe şansek. Bi serkeftina vê pêvajoyê civak dê bi rûmeta xwe, bi maf û nasnameya xwe bijî. Dê dikaribe bi nasnameya xwe siyaseta demokratîk bimeşîn e. Em bi hêvî ne ku dê jiyan ji tarîtiyê derbasî ronahiyê bibe.

***Ji bo demokratîkbûn û aştiya civakê pêwistî bi çi heye?***

***Di serî de mafê nasnameyî:*** Ziman, çand, bawerî.

***Hevbeşî û wekhevî:*** Civakên cihêreng divê bi hev re bijîn, wekhev bin, ne di ser hev re bin.

***Beşdariya siyasî:*** Divê civak bi awayekî aktîf beşdarî siyasetê bibe.

***Wekî DAD hûn xwe di ku dera vê pêvajoyê de dibînin?***

Em xwe di vê pêvajoyê de dibînin wekî awazeke civakî ku dengê kesên bêdeng e. Em ne partî ne, lê dibêjin mafên civakên Elewî hene mafên taybet in. Di pêşketina "Aştî û Civaka Demokratîk" de em jî digihêjin ew mafên xwe yên bingehîn. Em ji vê yekê bawer in. Em wekî DAD hewl didin ku di siyaseta aştiyê de, civaka Elewî jî hebûna xwe biafirîne.

***Erk û berpirsyariya we di demokratîkbûn û aştiya civakê de çi ye û hûnê çawa beşdarî vê pêvajoyê bibin?***

Em wekî DAD hewl didin ku; hebûn û baweriya Elewiyan bi zagonî bê nasîn û bi vê pêvajoyê misoger bibe. Civaka Elewî jî di nav gel û civakan de bi nasnameya xwe bê pejirandin. Em jî tevli xebatên akademî û tayînkirina pêşerojê bibin. Her wiha em armanc dikin ku di vê pêvajoyê de tevlêbûna civakan pêş bixin.

***Hin derdor vê pêvajoyê wekî çareserkirina pirsgirêka gelê Kurd û Tirk dibînin. Hûn çawa dinirxînin?***

Rastiyeke xwe heye! Di bingeha xwe de şerê ku bi dehan salan e di navbera gelê Kurd û dewletê de diqewime ji ber polîtîkayên red û înkarê ne. Di encama têkoşîna bi dehan salan ev pirsgirêk tê nîqaşkirin û ji bo çareseriyê îro pêvajoyek hatiye destpêkirin. Lê ev pêvajo ne tenê çareseriya pirsgirêka gelê Kurd e di heman demê de dê bibe çareseriya hemû pirsgirêkên li Tirkiyeyê. Beriya her tiştî bi serkeftina vê pêvajoyê dê aştî pêk bê, demokrasî, azadî û wekhevî ,heq û edalat pêk bê. Em bi vî rengî li vê pêvajoyê dinêrin û dinirxînin. Lê di heman demê de, eger ev pêvajo bi ser nekeve dê siyaseta îslama sunî, yekperstî, şer, xizanî, bêhiqûqî pêş bikeve û dê ev yek jî rê li ber xeteriyên mezin ên jiyanî vebike. Em dibêjin: rêya rast nasîna reng û netewên cûda, gel û civakan, çand û baweriyan e.

***Ji damezirînerên PKKê Alî Haydar Kaytan û Riza Altûn şehîd bûn. Li ser kesayet, têkoşîn û pênaseya derwêşî û pîrtiyê hûn dikarin çi bêjin?***

Alî Haydar Kaytan û Riza Altûn ne tenê têkoşer bûn, ew jî li ser baweriya Elewîtiyê bi hiş û hestên pîrtîyê dijiyan. Her du jî hem di warê baweriya Elewîtiyê de û hem jî di nav têkoşîna siyasî de cihê girîng girtin. Ji hêla civaka Dêrsimê ve wek derwêşên Rê (Rêya Heq) hatin pejirandin. Li Dêrsimê ji bo wan pêşengê Rê tê gotin. Rê li Dêrsimê dikare ji mêrxasiyê bibe derwêşiyê.

***Gotin an jî banga te ya dawî hebe kerem bike?***

Ez dikarim vê bêjim; bi hevdu hembêzkirinê, bi hev nasînê, bi dawîkirin red û înkarê em dikarin aştiyeke bi rûmet û azadiyê ava bikin. Divê her kes, her netew, her bawerî bê beşdarê vê pêvajoyê bibe. Em amade ne ku aştiyeke bi rûmet ava bikin.

Herî dawî ji bo Rojnameya Xwbûnê û hemû xwînerên rojnameyê silav û rêzên xwe yên germ dişînin.

### Pîr Zeynel Kete Kî ye?

Pîr Zeynel Kete di sala 1970yî de li gundê Tozkoparan (Tanz) yê Pertaka Dêrsimê hatiye dinyayê. Li Dêrsimê mezin bûye. Dibistana navîn û amadehiyê li Pertekê qedandiye. Di sala 1995an de jî Fakultêya Perwerdeya Zanîngeha 100. Yilê qedandiye. 20 salan mamostetî kiriye. Di nav Egitim-Senê de têkoşîna ked û mafan daye. Di sala 2016an de bi KHKê ji kar hatiye avêtin. Ji bo parastina baweriyan Eleviyan, jiyan û bîra civakî û parastina nirxên demokratîk lêkolînan dike. Li ser dîrok, çand û baweriyê, pirsgirêkên civaka Elewiyan, bi gelemperî di rojname û kovarên cuda cuda de dinivîse. Bi taybetî di rojnameya Yenî Yaşam, Yenî Ozgur Polîtîka, Peyik û Kovara Semah de dinivîse.

Di heman demê de serokê karê nivîsan û endamê komîteya weşanê yê Kovara Zulfîkar e. Di vê kovarê de jî bi taybetî li ser hevpeymana demokratîk a baweriya Eleviyan, nirxên komînal, rêbaza azadiya jinan û ekolojîya civaka Eleviyan dinivîse. Di sala 2018yan de jî bi awayekî çalak di Partiya Demokratîk a Gelan de (HDP) dest bi siyasetê dike û li Edeneyê dibe bernamzetê parlameniyê. Lê Lijneya Bilind a Hilbijartinan (YSK) namzetiya wî betal dike. Niha jî Hevserokê Giştî yê Komeleya Elewiyên Demokratîk (DAD) xebatên xwe dimeşîn e. Di heman demê de yek ji Pîrê baweriya Elewin e.

# Nivîskar û helbestvanekî bîreweriyê

Di şevên herî tarî de, wek stêrkeke birûskdar bû li gel rojê. Di asîmanê dîroka gelê xwe de, çerxa gerdûnê bi ronahiya xwe xemiland û bingeheke zindî ji atmosfera jiyanê re afirand, li gel rêhevalên xwe





Hogir Berbir

Jiyan ne tenê dem e, mozaîka şopan e. Bi pênûsa wêjeyî li ser rûpelên axê bi aheng tê nivîsandin û şopeke mayînde dihêle. Carinan wek çemekî bêdeng diherike, di nav sîrava sibehên mijûmoran de rêya xwe dibîne. Carinan jî wek daristaneke kûr, bi dengê bayê bi rîtma xwezayê tê xemilandin. Jiyan dibe stranên pîroz, ku ruh bi melodiyên xwezayî ber bi lêgerîna heqîqetê ve tê bilindkirin. Şopên nepen vedike, ne tenê nav, agirê dilê mirov jî di vê atmosferê de diyar dike, hinekî ji jiyanê vediqetîne û wek diyarî pêşkêş dike.

Di nîv sedsala dawî ya dîroka Kurdan de, tabloyeke rengîn hatiye afirandin, ku her xêza wê çîrokeke têkoşînê û her renga wê ahengeke bêhempa dihewîne. Di kûrahiya vê tabloyê de, bi hezaran lehengên bênav, bi bêdengî veşartî ne; şopa wan mîna ronahiya stêrkan, di nav demên nediyar de dibiriqe. Yek ji van stûnên bîreweriyê, hevalê Fuat (Elî Heyder Kaytan) bû. Stêrkeke di asmanê bêdawî yê dîrokê de, ku bi çirûskeke ronahî rê li ber me vekir.

Heval Fuat ne tenê mirovek bû, liv û lebatek bû, wekî bayê azadiyê yê ku di quntarên çiyayên asê de bi hêl û mêl diherikî. Derwêşekî hezar salî bû, bi ruhê xwe yê lêgerîner, li pey ronahiya heqîqetê dimeşiya. Çavên wî ne tenê dîmen, xewnên gelê xwe didîtin. Destên wî ne tenê çek, pênûs jî hildigirt; bi qîr û hawar bangî mirovahiyê dikir: "Ey Însan!... Hey Dîrok!.." û mifteya deriyê azadiyê nîşan dida.

Ne tenê dewrêşekî çiyayan bû, şervanek bû ku çiya kiribû wargeh, tebat û nebat kiribû hevrê. Şoreşgerek bû, dilê xwe kiribû dergûşa mirovahiyê. Rewşenbîr û helbestvanek bû, ku bi pênûsa xwe destanên nemir di nav rûpelên dîroka qirêj de rêz dikir. Di 45 salên vê jiyanê de, meşeke bêrawest jiya. Her kêlî bi kelecaneke bêhempa, bi aheng û dilsoziyeke bêqusûr, gavên wî ber bi refên pêş ve diçûn.

Erê, heval Fuat ne tenê "siyasetmedar, gerîla, rewşenbîr û helbestvanek" bû, şervanekî heqîqetê yê dilsoz bû. Wî bi pênûsa xwe helbestên nemir honandin, bi çeka xwe azadî parast. Bi hişmendiya xwe ramanên nûjen afirand, bi dilê xwe hêvî belav kir. Çîroka wî wekî çemekî zelal di dilên nifşên nû de herikî û navê wî, mîna tîpên zêrîn, li ser rûpelên dîrokê bi hûrbînî hate neqişandin.

Çil û pênc salên dawî wek pêlên deryayê kir beşek ji meşa azadiyê ya gel. Di her qonaxê de, wî wek ronahiyekê rê nîşan da, wek rêpîvanekê helwesteke hevpar afirand. Ne tenê bi kirinên xwe, bi ruhê xwe yê ku ji carî nehejiya, bandor kir. Jiyana wî bû dîwaneke helbestî, qada şêwrê bi wateyên kûr tijî kir û her rêzika wî dil bi hestên xweş dijenand. Ne tenê çîrokek, destanek bû; wek straneke ku li ber bayê guhan bilind dibe û di nav dengê çiyayan de ahengeke daîmî dihêle; hebûneke xurt li xwebûna heyî zêde kir.

Di şevên herî tarî de, wek stêrkeke birûskdar bû li gel rojê. Di asîmanê dîroka gelê xwe de, çerxa gerdûnê bi ronahiya xwe xemiland û bingeheke zindî ji atmosfera jiyanê re afirand, li gel Mazlûm, Kemal, Egît, Sakîne û bi deh hezaran şopdarên vê rêça pîroz. Tu ne yê dawî bûyî ku rojekê hat û Riza jî li dû te ket rê.

Wiha çîroka jiyanê bi destaneke bêhempa ji nû ve hate honandin. Ji nifşên îro û pêşeroja gelan re, tu bûyî îlham û çavkaniyeke bêdawî. Ev heqîqet, bi vê rêça pîroz re, mîna pizotê agirê Kawayê Hesinkar, tu û Riza kirin nemirên dawî yên destpêkeke nû.



Arslan Ozdemir

# Omer Xeyam: jîndarê zanist û edebiyatê

*"Wekî ku Omer Xeyam gotiye, jiyan wek qedeheke şerabê diherike; ya girîng ew e ku meriv wê bi zanebûn û bi rêkûpêk vexwe."*

Omer Xeyam wekî yek ji girîngtirîn bîrmendê sedsala 11an, hem ji aliyê edebî û hem jî ji aliyê zanistî ve kesayetekî navdar e. Lê belê, ji ber hin îfadeyên di rubaiyên wî de îro têgihiştineke xelet e ku ew tenê wekî helbestvanekî "serxweş" tê hesibandin.

Omer Xeyam di sala 1048an de li Nîşapurê hatiye dinyayê û di sala 1131an de miriye. Di warê matematîk, astronomî, felsefe û wêjeyê de berhemên girîng derxistiye holê. Xebatên wî, bi taybetî li ser Cebîr û dahûrandina hevkêşeyê ne. Di dîroka matematîkê de kedeke mezin daye. Wî her wiha rêberiya ekîba ku Salnameya Celalî amade kiribû kir. Bû alîkar ku yek ji teqwîma herî rast a dema xwe were afirandin.

Aliyê Xeyam ê edebî herî zêde bi rubaiyên wî derdikeve pêş. Di rubaiyên wî de mijarên wekî jiyan, qeder, mirin û ramana azad tê nîqaşkirin. Her çend wêneyên şerab û şahiyê gelemperî ne jî, şaş e ku meriv wan rasterast li hedonîzmê kêm bike. Gelek lêkolîner diyar dikin ku Xeyam şerab ne tenê wekî vexwarinê, di heman demê de wekî metafora azadî, hişmendî û pirskirina wateya jiyanê bikar aniye.

Omer Xeyam yek ji girîngtirîn zanyarên serdema xwe tê hesibandin. Xebata wî ya di astronomiyê de çavdêriyên herî rast ên serdemê dihewîne. Hesabên ku wî di dema amadekirina Salnameya Celalî de kir, paşê îlhama salnameya mîladî da. Her weha ew bi xebata xwe ya ku beşdarî pêşketina geometriya spherîkî dike jî tê zanîn.

Çend sedem hene ku Omer Xeyam wekî "serxweş" tê binavkirin:

Mijarên şerab û şahiyê di rubaiyên wî de bûne sedem ku ew wekî helbestvanekî ku tenê ji şerabê hez dike were dîtin. Lê belê ev yek di helbestên wî de îfadeyeke sembolîk e û banga azadbûna ji qedexeyên dinyayê ye.

Nepejirandina wî ji aliyê rayedarên olî yên wê demê ve bû sedema berovajîkirina bi qestî ramanên wî. Xeyam li hemberî ramanên dogmatîk ên wê serdemê nêzîkatiyeke lîberal nîşan da û ev jî bû sedem ku ji aliyê hin koman ve bê dûrxistin.

FitzGerald, ku Xeyam di sedsala 19an de bi cîhana rojavayî da nasîn, dema ku rubaiyên wî wergerandibûn kûrahiya mîstîk û felsefî kêm kiribû û giraniya li ser şerab û şahiyê bêtir eşkere kiribû. Ev yek bû sedem ku têgihiştina "helbestvanê serxweş" li Rojava çêbibe.

**Omer Xeyam ne tenê helbestvan e û ne jî tenê zana ye. Ew feylesofek e ku ramana rasyonel diparêze, matematîkzanek beriya dema xwe, stêrnasek mezin e ku li ezmên lêkolîn dike û helbestvanek e ku jiyana mirovan dipirse. Ku mirov wî bi tenê weke helbestvanekî "serxweş" bi nav bike, mirovekî mezin ê zanist û wêjeyê di qalibekî teng de bihêle. Ji ber vê yekê ji bo ku Omer Xeyam têbigihêje, ne tenê li rubaîyên wî, li berhemên wî yên zanistî û felsefî jî bi baldarî binihêre.**

**Nasnameya Xeyam a rast divê bi keda wî ya zanist, huner û ramana azad were fêmkirin. Rast têgihiştina vî ramanwerê gewre ku bi nêzîkatiya xwe ya azadîxwaz û pirsiyarî di dîrokê de xwedî cihekî taybet e, dê hem li ser dîroka zanist û hem jî wêjeyê nêrînek saxlemtir peyda bike.**

***Çavkanî:*** Ronesansa Rojhilata Navîn, Özdemir, Arslan, Sınırsız Yayınları, 2023






Dildarê Amedê

## Teşqeleyên ciwanan

Ciwanên 15-16 salî herî zêde delaliyên xwe li dayikên xwe dikin.

Her wiha dilên dayikan ê nazik û bi şewat ji bo armancên xwe bikar tînin.

Sero jî wekî gelek kesan di xortaniya xwe de delaliyên xwe li dayika xwe dikir.

Diya wî çi xwarin dida ber Sero, Sero dikir çinevin û lêvên xwe dirêj dikir, bi xwarinan qayil nedibû.

Çi ji diya xwe dixwest, dayika wî ne bi dilê wê be jî bi ya Sero dikir.

Piraniya ciwanên 15-16 salî çi ji dayika xwe bixwazin dayikan mecbûr dikin ku hemû daxwazên wan qebûl bikin.

Hinek dibêjin tu filan tiştî ji min re nekirî ez ê ji malê birevim û herim cihekî ku kes ji we nema min bibînin.

Hinek dibêjin hûn telefoneke destan a herî buha ji min re nekirin ez ê intihar bikim.

Welhasilî her ciwanek li gorî daxwazên xwe bi gef û hîleyan nazdarî û dilşewatiya dilê dayikan ji bo daxwaz û berjewendiyên xwe bikar tîne.

Li ba me Kurdan jî ciwan tevî van hemû rêbazên tirsandina dayikan serî li rêbaza 'heke tu ji min re filan tiştî nekî ez ê herim çiyê' didin.

Sero jî yek ji wan ciwanan bû ku bi vê rêbaza xwe her tiştê xwe bi dayika xwe dida qebûl kirin.

Rojekê dîsa bavê Sero hat malê dît ku dayika Sero hêsiran dibarîne.

Bavê Sero ji hevjîna xwe pirsî û got xêre dîsa çi bela Sero ye.

Dayika wî got, bi şîvê qayil nabe, ez çi didimê dibêje ez naxwim.

Bavê Sero got tamam, dest jê berde heyran, naxwe naxwe, tu çima ewqasî didî pey wî.

Dayikê bi îşaretan ji bavê Sero re got, hiş be bila dengê te neçê, dê ji malê biçe.

Bavê Sero got ka were meseleya wî ji min re bêje.

Dayikê bi çavekî tijî hêsir got, Sero dibêje hun bi ya min nekin ez ê biçim çiyê.

Bavê Sero got tamam dermanê wî li ba min e.

Bavê Sero gazî wî kir û jê re got,

Sero min bihîst ku tu dixwazî biçî çiyê. Ser çavan, bi soz û peyman heke tu vê ezmûnê derbas bikî ez ê bi destê xwe te bibim heta serê çiyan û teslîmî hevalan bikim.

Sero bi awayekî matmayî, ji bavê xwe pirsî û got ezmûna çi tu çi dibêjî ez fêm nakim.

Demsal zivistan e û hinek berf jî li erdê heye.

Bavê Sero jê re got; kurê min ê qehreman, ez heyrana wan çavên te yên mêrxas bim. Heke tu vê ezmûnê derbas bikî wê serê min ji ber te bilind be û ez ê te bighînim mirazê te.

Sero got de ka bêje ezmûna te çi ye?

Bavê Sero betaniyek da destê Sero û got de rabe kurê min em biçin ser banê xanî, heke tu Îşev heta serê sibehê karibî le ser banî bimînî, bi soz ez ê te bibim teslîmî hevalan bikim.

Bû çinevina Sero lê bavê wî guh nedayê, bi destê wî girt ew bir ser ban û deriyê ban lê girt.

Lê Seroyê me ne heta serê sibehê, heta 10 deqeyan xwe li ber wê sermayê negirt û bû hewar û gaziya wî bang li diya xwe kir.

Diya Sero bi zorê bavê wî qayil kir ku derî lê veke û were hundirê malê.

Bavê Sero jê re got min zanibû ku tu ne ew mirovê wêrekî, loma min ev ezmûn ji te re çêkir.

Heke min zanibûya tuyê biçî serê me bilind bikî, min ê tu bi dahol û zirneyê bişandayî. Lê ez dizanim ku qûna te ne ew qûne Sero.

Ji wê rojê pê de êdî Sero çi dihat ber dixwar û tu wateya wê gefa ku li diya xwe dixwar nemabû.

Bi giştî ciwan di vî temenî de gelekî bêcir dibin û dixwazin her tiştî biceribînin. Di wan ceribandinên xwe de herî zêde teqlîda mezinên xwe dikin. Di wî temenî de ew bavê ku di çavên zarokan de her tiştî dizane êdî namîne. Lewre di wî temenî de peywîra herî mezin û ezmûna herî dijwar a dê û bavan e.

# Lêgerîna statuya kurdan a hezar salî

Di van demên dawîyê de li ser banga Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêvajoya ku dest pê kiriye û gavavêtina PKKê ya ji bo dema nû, lêgerîna statûya kurdan careke din aniye rojevê. Niha êdî dem dema kurdan e



Serdar Altan

**"Kurdistan mêtingeh e!"**

Gava ev peyva bi sêhir yekem car li guhan teqiya, di rastiyê de hîmên bingehîn ên xebateke 50 salî jî dihatin avêtin. Serhildana 29an ku di bin serokiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de wê dest pê bikira, bingeheke nû ya lêgerîna statûya Kurdan a li Rojhilata Navîn bû. Lê ev pirsgirêk ne pirsgirêkeke ji rêzê bû, lêgerîna statûya hezar salî bû. Danûstendina netewedewletan ku ligel moderniteya kapîtalîst tevahiya cîhanê teqandin û nîzama nû ya cîhanê ku ji aliyê pergala ku çêbû ve hat afirandin, derfeta jiyanê nade Kurdan. Gava mirov di çarçoveya dîrokî de dinihêre, Kurd ku yek ji gelên herî qedîm ên vê erdnîgariyê ne, ji dîroka kevnar heta niha gelek xebat kirine ku rastiya xwe bihebînin û heya roja îro jî hewl dane ku hebûna xwe biparêzin.

"Eger sosyalîzmên me yên dused salî jî li kapîtalê asîmîle bûne, belkî jî em nikarin ji nav tayfeya lanetdarên ku dikarin çarenûsa heman ji bîra leşkerên wan îdealên mezin ên mirovahiyê bînin. Ji bilî vê, em nikarin Sokrates, Budha, Zerduşt bêdeng bihêlin û peyvên wan ên dawî hatine gotin tine hesab bikin. Heta ku em wan jiyandar nekin û weke duh ji me re nû neyê, em ê wisa hesab bikin ku ji felsefeya azadiyê tiştek nehatiye fêmkirin. Mirovahiya ku dinale heye, xwezaya ku bêyî bersivdana ezeban wê hatiye xerckirin heye. Evîna ku bêyî rawestandin îxanet lê hatiye kirin heye. Bêyî ku em bersivê bidin van tiştan em dikarin ji kîjan jiyanê biaxivin?" (Abdullah Öcalan, Manîfêstoya Şaristaniya Demokratîk)



Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan gava van gotinan dibêje, di esasê de bal dikişîne ser rastiyekê jî. Ev axaftin ku lêgerîna hezar salî ya Kurdan watedar dike, cihê ku têkoşîn divê tê de bê bicihkirin û tiştên ku divê bêne kirin destnîşan dike. Di rastiyê de ev nêzîkbûn ku dikare wek serhildana li dijî pergala nû ya cîhanê bê hesabkirin, her wiha nîşaneya cewhera azadî û nirxdayîna jiyanê ye.

**Hebûna kurdan**

Kurdan di dîrokê de her tim hewil dane ku xwe li erdnîgariya xwe biparêzin. Parastina hebûna xwe, parastina ziman û çanda xwe, li dijî şeran, êrişên ji aliyê mirovahiyê ve qonaxeka girîng bû. Lê Kurdan ev yeka ne tenê ji bo li piyamayînê kirin, hewldan ku bibin pêşengê dildarê azadiyê ya ku dê li dîroka mirovahiyê bê diyarîkirin jî nîşan bidin. Ji çiyayên Zagrosan, çoltara Nînova, navbênka Dîcle-Firatê, li deşta Haleb û Şamê, ji diyarên Anatolyayê û ji hemû rastiya erdnîgariya ku li wê belav bûne, xwestine xwe li cihekî bi cih bikin, xweseriya xwe biparêzin û her tim hewildane ku ziman û çanda xwe bidin jiyandin. Ji Kawa dest pê bike, heta Selaheddîn, Ebu Muslim û heta pêvajoya berxwedan û serhildanan di nav lêgerînekê de bûn. Lê mijara ku vê yekê çima û çawa kirine di serê mijaran yên ku di her serdemê de têne niqaş kirin de cih digre.

Di rastiyê de berxwedan û serhildanên kesayetiyên kurd ên ku ehemiyeta dîrokî tê de hene rastiyeke din jî eşkere dikir. Rêxistin û rêkeftinên kurdan ên dîroka berê, têkoşîna ku bi rê ve birin ne tenê ji bo Kurd û Kurdayetiyê bû. Ji bo parastina gelên din ên ku pê re dijîn û ligel zayîna Îslamê zêdetir ligel motîfên Îslamî pêk anîn. Helbet ev tesbitek e, ne lêpirsîn e. Helbet em dikarin ji hebûna sedemên pir aloz ên ku vê tesbitê çêkirine biaxivin. Lê belê ev rewş, rastiya ku mirov bifikire kurd çawa tevgeriyane naguherîne.

**Parastina gelên din**

Kurd, li erdnîgariyeke ku ereb, fars, ermen, azerî, tirk, cardin asûrî-sûryanî, Keldanî û gelek gelên din jiyane dijîn. Ligel van gelan hem cîran bûne, hem bi van gelan re di nav hev de jiyane. Vê rewşê, ligel pêvajoyên erênî yên ku ev têkeliya gelan sazkiriye, gelek kêmasî jî bi awayekî cidî di nava xwe de hewandiye. Helbet pêvajoya dîrokî vê yekê ji me re bi awayekî zelal nîşan dide. Di gel ku di nava dîrokê de di serî de baweriya Îslamê, Ereb û Tirkan û gelek gelên Rojhilata Navîn ji aliyê Kurdan ve hatin parastin û xwedîkirin, ne Kurd ne jî gelên ku hatine parastin di mijara hebûna statûyeke taybetî ya Kurdan de tiştek nekirin. Berovajî gelek caran rastî êrişên van dewlet an miletên cîran hatine. Di dîroka nêz de dabeşkirina Kurdistanê bi çar perçeyan û şerê ku di her perçeyê de tê meşandin mînaka herî zelal e.

**Dem dema Kurdan e**

Gelekî weke Kurdan ku ewqas mezin be û bi hezarên salan li ser vê erdnîgariyê bê statu mabe, belkî jî heq dike ku bi vê taybetiya xwe li dîroka cîhanê bibe mînak. Lê belê êdî aşkere ye ku ev bi vî awayî nayê qebûlkirin. Ne Kurdên ku li çar perçeyên Kurdistanê dijîn vê yekê qebûl dikin, ne jî sîstema nû ya cîhana ku îro li Rojhilata Navîn dixwaze proseseke nû ava bike dikare vî barî bêyî Kurdan hilgire.

Di van demên dawiyê de li ser bangkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan pêvajoya ku dest pê kiriye û gavavêtina PKKê ya ji bo dema nû, lêgerîna statûya Kurdan careke din aniye rojevê. Niha êdî dem dema Kurdan e.

# Divê dewleta Tirk jî xwe fesix bike



Hesen Huseyîn Denîz

Ji avabûna Komara Tirkiyê û vir ve di navbera Kurd û kesên xwe wek "Tirk" bi nav dikin de pevçûneke hevnepejirandinê heye. Kurd dixwezin li ser axa xwe, bi vîna xwe azad bijîn û ji sererd û binerdên xwe sûd bigirin. Lê kesên xwe wek "Tirk" bi nav dikirin, ev yek nepejirandin û dest danîn ser welatê Kurdan, sererd û binerdê wan talan kirin û xwestin wan wek xwe bêesl û tine bikin. Sedema ku ez dibêjim "kesên xwe wek "Tirk" bi nav dikin ev e: Li Tirkiyeyê hejmara Tirkan gelekî ji ya miletên din kêmtir e. Îro kesên ji xwe re dibêjin "Tirk" di rastiyê de ne Tirk in, kesên ji ser eslê xwe hatine derxistin û guherandin, ku ji tirsa sazûman û dewletê û ji ber berjewediya aborî xwe wek "Tirk" bi nav dikin, komara Tirkiyê bi rê ve dibin.

Ji bo wê lihevhatineke rastîn a ji dil a di navbera "Tirk" û Kurdan de pêwîstiyê bi hilweşandina dewleta Tirk dibîne. Çawa ku dewleta Komara Tirkiyeyê di sala 1923an de li ser bingehê înkarkirina gelên herêmê hat damezirandin, piştî sed û du salan, gava ev dewlet ji Kurdan devjêberdana çekan û xwefesixkirina partiya herî xurt dixwaze û qala aştî, biratî û lihevhatinê dike, wê demê, divê ew jî li hember Kurdan dev ji bikaranîna çekan berde û sazûmana xwe ya nijadperest û desthilatdar a înkar û îmhayê fesix bike. Riya vê jî di guhertina her çar xalên destpêka zagona bingehîn a Tirkiyê re derbas dibe.

Serkêşê Tirkiyê Erdogan bang li partiya muxalefeta Tirk dike ku zagona bingehîn di çarçoweya pêvajoya lihevhatinê de biguherine û bi bangê re dibêje, her çar xalên destpêkê ne mijara guhertinê ne. Wê demê tê çi bigiherî? Tiştekî tu biguherî namîne, lê em dikarin li vir rê bi ber serkêşê dewleta Tirk bixin û jê re bibêjin, ku divê tu destpêkê van her çar xalan wiha biguherî:

Xala yekem dibêje dewleta Tirkiyeyê komarek e.

Destpêkê divê were zanîn ger ev dewlet wê bibe a Kurd û Tirkan û bêguman a gelên din û lihevhatineke civakî çêbibe, divê peyva Tirkiyeyê êdî neyê bikaranîn. Wateya Tirkiyeyê, axa Tirkan e. Kurd ji Kurdistanê ne; di dîrokê de navê axa Kurdan Kurdistan e. Ti hêz, dewlet an partî nikare vê rastiyê bide guhertin an çewtkirin, an jî bîrkirin. Ger wê di navbera Kurd û Tirkan de aştiyeke bi rûmet çêbibe, wê demê divê navê Komara Tirkiye êdî neyê bikaranîn, dikarin hemû gelên li ser vê axê hatine înkarkirin nêrîna xwe diyar bikin û navekî, ku hemû nasnameyan hembêz dike were hilbijartin û di zagonê de, ji bo xala yekê ev were gotin, lê Komara Tirkiyê qet nabe, ji ber ku çima Kurd, Ermen, Pomak, Gurcî, Asûr, Ereb, Çerkez, Laz li ser axa bi navê "Tirk" bijîn û bibêjin ev der welatê min e? Bila wê demê navê dewletê Komara Kurdistanê be û bila Tirk bipejirînin, ku ew li Kurdistanê dijîn.

Xala 2yan a zagona bingehîn qala girêdayîbûna netewperestiya Ataturk dike. Vî Ataturkî bi dehan kalikên Kurdan darvekirine. Bi sedan û hezaran pêşengên gelên din daye qirkirin. Gelên niha bi Tirkan re aştiyê û lihevhatinê bikin wê çima girêdayî nijadperestiya wî bin, ku ev yekser tê wateya parastin û girêdayîbûna berjewendiya nijada Tirk. Ev yek jî divê ji zagonê were derxistin û li şûna netewperestiya Ataturk, mafperestiya hemû gelên li ser vê axa Anatolya, Trakya û Mezopotamyayê dijîn were bikaranîn.

Xala 3yan a zagona bingehîn dibêje ku sirûda neteweyî sirûda îstîklalê ye û paytexta wêlêt Enqeeye ye. Dinya alem dizane ku sirûda îstîklalê ya Tirk sirûdeke nijadperest û tirkparêz e. Li dijî hebûna hemû gelan e. Kurd an jî neteweke din ên li ser vê axê dijîn, vê sirûdê wek sirûda xwe ya îstklalê napejirînin û wê qebûl nakin. Divê sirûdeke nû ya li gor aştiya civakî û hembêzkirina hemû gelan ji nû ve were nivîsandin. Û ger di navbera gelan de, bi taybetî di navbera Kurd û Tirkan de wê aştî û lihevhatin çêbibe, wê demê çima lingekî paytextê ne li ser axa Kurdistanê be? Ji xwe ger lihevhatin çêbibe pêwîstî bi sazûmana dewletî ya her tiştî bi xwe ve girê dide namîne û dikare wek Swîsreyê sazûmana kantonî, yan wek Almanyayê sazûmana herêmî were bikaranîn û wê demê her kanton an her herêmek dikare ji bo xwe paytextekê diyar bike û tev pêşniyara paytexteke hevpar a koordînekar jî dikarin bikin.

Xala çaran a zagona bingehîn a dewleta irk dibêje ku her sê xalên destpêkê nayên guhertin. Yanî zagona bingehîn bi xaleke taybet guhertina van her sê xalên nijadperest qedexe dike, ji bo wê divê destpêkê ev xala çaran were rakirin. Ti zagon ne fermana xwedê ye, tev bi destê mirovan hatine nivîsandin û dikarin bi destê mirovan werin guhertin.

Ger rayedarên dewleta Tirk bi rastî û duristî ji kiryarên xwe yên dagirkerî, xwînxwarî, mafxwarî û nijadperestî yên sed û du salan bi xwîn û zilmê bi rê ve birine û hîn jî bi rê ve dibin, poşman bûne, ders derxistine, ger dixwaze niha dixwazin bi gelên li herêmê (Kurd, Ermen, Çerkez, Pomak, Gurcî, Laz û hwd.) re aştiyê bikin, ger dixwaze pirên wekheviyê di navbera xwe û wan de saz bikin, ji hemû mafên wan re rêz bigirin û jiyaneke nû ya wekhev, ya li ser bingehê parvekirina mafên bingehîn û nasîna mafên hev saz bikin; wek birêz Ocalan dibêje pêwîstî bi peymaneke nû heye, divê ev peyman li ser bingehê xwefesixkirina dewleta Tirk a nijadperest be, ku ev jî pêwîstiyê bi guhertina her çar xalên destpêkê ya dewleta Tirk dike.

Pîvana duristbûna Bahçelî, Erdogan, Ozer û hemû aliyên Tirk ê niha ji kadroyên PKKê zêdetir bûne Apocî, nîşandana vîn û biryara guhertina her çar xalên destpêkê yê zagona bingehîn a dewleta Tirk e, ku ev jî tê wateya xwefesixkirina dewleta Tirk û li şûna wê avakirina sazûmaneke hevbeş a bi vîna hemû gelên li ser axa Mezopotamya, Anatolya û Trakyayê dijîn.




Ji bilî vê çi gotin û çi guhertina di zagona bingehîn de wê pirsgirêka di navbera kesên xwe wek "Tirk" bi nav dikin û hemû gelên din ên li herêmê dijîn û bi taybetî gelê Kurd û hemwelatiyên Kurdistanê de çareser neke. Ger îro çek werin berdan jî deh sal, sed sal jî derbas bibin, Kurd wê dev ji doza bidestxistina azadî, wekhevî û serweriya xwe ya li ser axa dapîr û bapîrên xwe bernedin. Li ser vê rêyê Kurd tev bimirin jî wê Kurdistan her bijî û herdem ji nav dilê xwe lehengên têkoşîna azadiyê derxîne. Ev dewleta nijadperest nikare bi navê Tirkbûnê û sirûda îstîklalê bibe demokrat, ji bo wê xwefesxkirin û li ser bingehê daxwazên aliyê Kurd avakirina komareke nû ya demokratîk a bi pêkhatina nûnerên hemû gelan û bi rêzgirtina li mafên hemû gelan dikare ev pêvajo bi serkeve.

# Banga 27ê Sibatê banga sedsalê ye

## Aştî bi zanista siyasî tê avakirin. Civaka demokratîk jî li ser nirxên exlaqî, aborî, edalet û huquqî tê avakirin. Ew nebin aştî çênabe û civaka demokratîk nayê avakirin



Medenî Ferho

Kurd 50 sal in li dijî curumkarî û kiryarên faşizan têdikoşin. Gelê Kurd, di vî şerê dijwar de dîrok xistine lêpirsînê. Banga Birêz Abdullah Ocalan a 27ê Sibatê, encama vê têkoşînê ye û destpêka dadgehkirina dîroka sed salî ye.


Di pêvejoya “Aştî û Civaka Demokratîk” de herî zêde nirxandina sosyolog, akademsiyen û hin pedegogan bala min kişandiye. Ji ber ku ew dibêjin, Birêz Abdullah Ocalan hemû termên neo“îst” û yek”îst” red kirine û rewşa xitimî bi dawî kiriye. Dîtina wan a hevpar jî ew e ku banga Birêz Ocalan û biryarên Kongreya 12mîn a PKKê, di aliye zanista civakî û disîplîna dîrokî de giring in û dibêjin; bandoreke mezin li cîhanê kiriye.

Ji bo vê jî banga Abdullah Ocalan wek “banga sedsalê” binav dikin. Ev tê wateya ku kevirên di rêzkirina riya paşerojan de bi taybetî li Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn, ji nû ve têne danîn. Ferhenga demokrasiyê û civakî tê guhertin.

Rast e; hem rêya dîrokê, hem ferhenga demokrasiyê ya li Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn ji rêyên dîrokî û ferhenga demokrasiya cîhanê cuda ne. Tirkiye û tevahiya dewletên li Rojhilata Navîn, ji “şablon” û paşverûtiya tarî ya împeretoriya Osmanî dûr neketine. Hîna di sîstema “evd-xwedî” dewşîrmetiyê dene û azad nebûne. Hemû desthilatdariyên van dewletan, di sedsala navîn de asê mane û guhertinek nekirine. Her tişt medî ye. Ew madiyet jî di destê desthilatdaran de şûrê bi xwîn e.

Hin desthilatdarî, di bin navê “komar”geriyê de bin jî, ji sîstema teokratîk, radîqalîzm û nîv monarşîk rizgar nebûne. Hişmendiya wan şûr û xwîn e.

Ne tenê mîratzadeyên Îtihat û Terakî yên Tirkiyeyê ku,”sêva sor” kirine diruşmeya xwe û aştiyê têkçûna xwe dibinin; Molleyên Îranê, mîrek û kralên Ereban jî biqasî çeteyên DAIŞê aşiqê “futuhat”ê ne. Navê wan dewlet e. Secdeya wan “text”e. Şemana wan û baweriya wan hûkûmranî ye. Xîlafeta veşartî ye.



Li van welatan zanista siyasî nîn e. Di korîdorên siyasî, yên van welatan de, nirxên exlaqî, rûmet, edalet û normên huquqî jî nînin.

Aştî bi zanista siyasî tê avakirin. Civaka demokratîk jî li ser nirxên exlaqî, aborî, edalet û huqûqî tê avakirin. Ew nebin aştî çênabe û civaka demokratîk nayê avakirin. Niha li Tirkiyeyê û tevahiya dewletên Rojhilata Navîn, bi awayekî sîstematîk, şaristaniya madî û lîstikên Koçberî-qirkirin-demografî” û êrişên tarî di pratîkê de ne. Jiyan kor, kerr û lal kirine. Dîrok kirine kavil û desthilatdar jî li hespên xwe siçwar in û pîkolê dikin.

Di şerê 50 salî de gelê Kurd, berdêlên giran dan, lê demsalên mirovahiyê guhertin, gramera şaristaniyê guhertin, hişmendiya avakirina jiyanê guhertin; bûne dengê gelên ku di şikeftan de hatibûn “kebîs”kirin.

Ji bo vê jî, gotinan sosyolog û akademîsyanan ku dibêjin, banga Abdullah Ocalan “banga sedsalê ye” rast e. Bi tecrube û têgihiştina dîrokê, civaknasî, dîplomatîk û feylesofî gav avêtiye. Lê gelo rayedarên Tirk-î Îslam û Tirk-î Turan rastî fêhm kirine? Dê operasyonan rawestînin? Tewşeleyên Bizansî, li Enqerê di pratîkê de ne.

Ji bo ve û ji bo guhertina mîratzedeyên dewşîrme, têkoşînek nû ya zanistî û perwerdehiya pîsokolojîk a rehebîlîtaysonê mercê nabe nabe ye!

Mixabin mîratzedeyên dewşîrme, hîna, bedcaniya “kizil elma” dijîn. Ev ruhekî mirî ye û Kurd jî mecbur in di vê pêvejoyê de bi vî ruhê mirî re têbikoşin. Rîsk zêde ne. Divê her du kefikên mêzîn, bi reform û ronesansê bên dagirtin. Têkoşîna li dijî ruhên nexweş zor e. Hele ku ev nexweşî, di aliye pîskolojîk û patalojîk de kûr bibe! Navê nexweşiya patalojîk “mîtomanî” ye û weke nexweşiya derewan jî tê binavkirin. Derew her dem dibine bingeha lîstikên qirêj. Guhertina van zewatan, wê ne hêsan be. Ji bo vê jî divê Kurd, bi hişmendiyeke têgihiştî û diyalektîka materyalist a dîrokê haraket bikin.

Desthilatdariya 22 salan a AKP/MHPê xwe weke “desthilatdariya ruhanî” dabe naskirin jî, bi zihniyeta yekparêz haraket kir û ev yekparêzî xurt û dijwar kiriye. Zihniyeta yekparêz, tenê di sîstemên dewşîrme de heye û weke tuhên bedcan tê binavkirin. Mirovên “dewşirme” dîrokê çênakin, dîrok jî wan çênake. Mixabin, teza Fernand Buraudel ku dibêje, “dîrok jî mirovan çêdike,” ji bo mirovên dewşirme derbas nabe.

Li gorî min; Divê mîratzedeyên dewşîrme, di aliye psikolojîk û psîkanalîst de werin tedawîkirin. Mixabin, derfetê Kurdan jî nînin ku ji bo wan navendên rehabîlîtayonê vekin: Rêya ku Kurd bişopînin ev e; divê her nivîs, her daxuyanî, her gotar û axftinên di miting, panel û kongreyan de, bi dersên zanistî û dîrokê dagirtî bin. Muhakemat-dadgehkirina vê serdema çareseriyê, wê bibe despêka tedawîkirin û rehabilitasyonê. Bêguman tedawîkirin û rehebaîlîtasyona komên xelkê, bi serdemekê sînordar nabe, serdemên dirêj dive.

Ya ku dile mirovan xweş dike ew e ku, civakên li Tirkiyeyê, di şerê nivsedsalê de, ligel gele Kurd dersên mezin girtine û perwerde bûne.

Xala metirsînî; elîta desthilatdariya mîratzede ye. Ev koma elît, bune jehra di kevir de û ji nirxên civakî dûrketine. Fetîşa alê û yek-yekan, pejirandine. pîvanên exlaqî winda kirine. Vê jî ew bi nexweşiya ”mîtomanî” xistine û dixwazin herka dîrokê rawestînin. Nexweşiya “mîtomanî” nexeşiyeke patolojîk e, bi taybetî di sîstemên dewşîrme de zêde heye.

Ji ber vê rewşa pîskopatî, deriyên têkiliyan û guhertinan kilît kirine. Têkoşîna nû ya Kurdan, wê bi zor û zahmetî be, lê têkoşîneke xurt û rêkûpêk, wê dikaribe kilîdên van deriyan bişkîne û jehra di kevir de paqij bike, hingî wê nexweşiya, “mîtomanî” jî tedawî bibe. Helbet, di erdnîgariyeke berfireh de têkoşîna civakî û kesayetî wê ne hêsan be. Civaka Demokrtaîk, modeleke nû ye û tenê li Rojava tev li ava çemê dîrokê bûye.

Ji bo berterefkirina van spekulasyonan divê gelek parantez bên vekirin. Divê di aliye dîroka civakî, erdnîgarî, siyasî û aborî ya Anatolya û Mezopotamyayê de bi berfirehî bê rawestin û zeafên dîrokî ji holê bêne rakirin. Ji bo vê jî divê, li gel 5 pirtûkên Birêz Abdullah Ocalan, hemû pirtûkên nivîskarên Kurd yên di nivsedsalê de hatine nivîsandin, li tevahiya Tirkiyeyê bên belavkirin.

# Şerê dîplomasiyê dest pê dike



Siyamed Sîpan

Dema em bala xwe didin cîhanê, em dibînin ku hemû cîhan di nava guhertineke mezin de ye. Min di nivîsên xwe yên berê de bahsa Şerê Cîhanê yê sêyemîn kiribû. Bi van pevçûn û şerên ku li cîhanê diqewim, cîhan teqez li ser pira guhertineke mezin e. Bêgûman em Kurd û Kurdistanî jî dê para xwe ji vê guhertinê bigirin. Bi vî şerê ku diqewime, hinek xalên guhertinê derdikevin holê:

☛ ***Sînorên nû:*** Bi van şer û pevçûnan bêgûman dê gelek sînor ji nû ve bêne danîn û hinek sînor jî dê bên rakirin.

☛ ***Hêzên nû:*** Dîroka cîhanê herdem nîşan daye ku bi guhertinan û herwiha piştî şeran hêzên nû derdikevin holê. Em dema bala xwe didin Rojhilata Navîn dibînin ku dê Îsraîl û Sudiya Erebîstanê xwe wek hêzên heremî bi cîh bikin.

☛ ***Hegemonên nû:*** Ne tenê li qadeke herêmî û parzemînî, her wiha li qada cîhanî jî hegemonên nû dê xwe ji nûve bi cîh bikin. Piştî şerê di navbera Rûsya û Ûkranya de, Rûsya hinekî li derveyî lîstikê hate hiştin. Bi vî awayî 2 hegemonên mezin hatin hember hev. Aliyek DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîka) û aliyê din jî Çîn. Herî dawî jî şer rûyê xwe bi xerc û bacên gumrikê ve xwe da der.

Ji bo me Kurdan jî elbet firsendên nû derdikevin holê. Em ji tunebûnê derketin, bûn hebûn. Ji hebûnê em bûn rêxistinek û partiyek. Bi vê partiyê me hêzêk ava kir. Em bûn aktorek li Rojhilata Navîn. Niha jî dem hatiye ku em xwe wek aktorekî xurt li Rojhilata Navîn bi cîh bikin, da ku em karibin destkeftiyên gelê Kurd biparêzin û pêş bixin.

Di vir de xala herî girîng jî şerê li ser raman, pênûs, xwendin û siyasetê ye. Anku şerê dîplomasiyê ye. Bi xebatên di vî warî de em dikarin li hemû cîhanê hêza xwe ya Lobiyê ava bikin. Ez her tim dibêjim ku sedema dewleta Îsraîl li nava hemû cîhanê ewqasî bi hêz e û xwedan peyv e jî, ji ber hêza wan ya Lobiyê ye. Ku em ji karibin li hemû cîhanê hêzeke wisa ava bikin, em ê karibin destkeftiyên xwe ewle bikin û pêşeroja xwe biparêzin.



Xwe fesixkirina PKKê ve çîrokeke pir kûr û dirêj bi dawî dibe. Bandoreke gelek mezin kir. Dê pêlên mezintir vede. Ez vêya hertim dibêjim, ji ber ku PKK ne tenê rêxistinek, saziyek û partiyek bû. Ew Tevgera Azadiya Gelê Kurd bû. Ji bo wê jî cîhê wê ewqasî mezin û girîng bû. Tevgera ku rehên xwe li nava hemû Kurdistanê û li nava hemû beşên civakê belav kiriye, mirov nikare hema wisa bi dawî bike û nikare tune jî bike. Tenê şikil û şêwazê hebûna xwe diguherîne. Xwe fesixkirin û danîna çekan tê wateya ku êdî rê û rêbazên din xurtir dike. Ev jî tê wateya ku xebatên li Ewropayê, li cîhanê heya niha dihatin meşandin divê 2 qatan zêdetir bibin. An jî 4 qat zêde bibin.

Êdî hemû Kurd û Kurdistanî dibê giraniya xwe bidin ser şerê nû. Şerê pênûs û dîplomasiyê. Bi gotineke din, Kurdan di şerê bi çek de xwe îspat kir niha êdî gerek xwe di şerê li ser maseya dîplomasiyê de îspat bikin.



Kurdistan Lezgiyeva

# Faşîzm xirabîyeke mutleq e

Di 25ê Nîsana 2025an de, Komara Îtalyayê 80ê saliya rizgarbûna xwe ji dagirkerên Nazî û rejîma faşîst a Mussolini pîroz dike. Di vê rojê de, 80 sal berê, partîzan, endamên Tevgera Berxwedanê, li bajarên bakurê Îtalyayê ku di bin kontrola Komara Civakî ya Îtalyayê ya kukla de bû û ji aliyê Almanan ve hatibûn dagirkirin, serhildanek rakir ku dawî li faşîzma neteweyî anî. Îro ew cejna neteweyî ya sereke ye ku bi dawiya Şerê Cîhanê yê Duyemîn ve girêdayî ye. Ne tenê Îtalîyan bi xwe, lê di heman demê de antî-faşîstan jî nûnerên gelek gel û neteweyan, di nav de zêdetirî pênc hezar partîzanên Sovyetê beşdarî berxwedan û têkoşîna partîzanan bûn.

Îtalî rizgarbûna ji faşîzmê wekî xala destpêkê ji bo jidayikbûna demokrasiyê û pergaleke nû ya nirxan a li ser bingeha azadî, edalet û hevgirtina civakî, bingehên yekîtiya gelê Îtalyayê û nasnameya wê dibînin. 25ê Nîsana 1945an wekî roja “ji nû ve zayîna” gelê Îtalyayê tê hesibandin. Li gorî S. Mattarella, ji hingê ve “li dijî mîkrobên nefret û dînîtiyê yên ku serpêhatiya xerab a Nazî-faşîst xwedî dikirin, hatine aşîkirin”. Îro, hişmendiya giştî ya Îtalyayê bi pêbawerî bîranîna encamên rejîma dîktatorî ya “bîst salên reş”, mîlîtarîzma emperyal a bêserûber û nijadperestiyê, bêtehamuliya li dijî nerazîbûnê û ferzkirina konformîzmê diparêze.

Partiyên koalîsyona rastgir ku îro hikûmeta Îtalyayê pêk tînin, bi zelalî qutbûna xwe ji mîrateya îdeolojîk a Tevgera Civakî ya Îtalyayê ya neofaşîst nîşan dane. Serokwezîr G. Meloni qebûl kiriye ku “faşîzm xirabiyeke mutleq e”, bi berdewamî teqez kiriye ku “partiya wê ya siyasî ti eleqeya wê bi nostaljiya ‘bîst salên reş’ re tune ye” û di êvara salvegera 79an a Rizgariyê de, wê destnîşan kir ku “serkeftina li ser faşîzmê bingeha vegera demokrasiyê danî” û “nerehetiya wê ji hemî rejîmên totalîter û otorîter” teqez kir.

Şerê Cîhanî yê Duyem bandoreke mezin li ser siyaseta derve ya Îtalyayê kir û hîn jî dike. Dibe ku taybetmendiya wê ya sereke di serdema piştî şer de dikare wekî xwesteka ji nû ve bidestxistina (û ne windakirina paşê) giranî û statuyê di qada navneteweyî de were binavkirin. Xwesteka tevlîbûna nav çembera “hêzên mezin” hêza ajotinê ya siyaseta derve ya Romayê berî Şerê Cîhanî yê Duyem bû. Lê bi hatina Mussolînî re ew pîvanek bêhempa bi dest xist.

Teslîmbûn destpêka serdemeke têkoşînê bû ji bo welêt. Asta bilind a bêbaweriyê ku dewletên serketî ji Îtalyayê re hebûn piştî ku Romayê di her du şerên cîhanî de du caran koalîsyonên hevalbendan guhertibû, bû faktoreke diyarker, bi saya vê yekê Îtalyayê, piştî ku “bijartina kampê” ya dawîn (“una scelta di campo”) li berjewendiya saziyên hevgirtina Euro-Atlantîk (di serî de NATO û YE) kir, hewl da ku wekî piştgirek domdar ê blokê tevbigere û xwe di çavên hevkarên xwe de ji nû ve ava bike. Îro em dibînin ku formula “un partner affidabile” çiqas caran di gotara siyasî ya fermî ya serokên Îtalyayê de tê bihîstin. Armanc dike ku teqez bike ku Roma hevkarek pêbawer ê hêjayî baweriyê ye.

Siyaseta derve ya hemdem a Îtalyayê mohra berpirsiyariyeke dîrokî ya ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn ve hildigire. Ev di pabendbûna domdar a bi pabendbûnên hevpeymaniyê yên ku ji hêla YE û NATO ve hatine girtin, di beşdarbûna çalak a mîsyonên navneteweyî, di xwesteka navbeynkariyê di çareserkirina nakokiyan de, di pirrengiyê, di aştîxwaziyê, di beşdarbûna çalak a mîsyonên navneteweyî de diyar dibe.

# Banga Ocalan û daxwaza gel: Ber bi serdemeke nû ve

## Banga Abdullah Ocalan, careke din girîngiya aştiyê derxist pêş û rêya çareseriyê bi awayekî aşkera nîşan da. Abdullah Ocalan di banga xwe de raxist ber çavan ku pirsgirêka kurd ne tenê pirsgirêka kurdan e

Kadîr Kiliç



Têkoşîna gelê kurd a azadiyê ya ku ji 50 salan zêdetir e berdewam dike, tenê hewldana nasandina nasnameyeke nîjadî nîn e. Di heman demê de rabûna li ser piyan a heqîqetên ku hatibûn bêdengkirin, dîroka ku dihat înkarkirin û vîna gelekî ya ku dihat pêpeskirin e. Ev têkoşîn, qasî ku êş û elem girtine nav xwe, hêviyan jî di nav xwe de dihewîne. Di roja îroyîn de, ev meşa dûr û dirêj gihîştiye qonaxeke gelek girîng. Xuyaye ku êdî serdemek bi dawî dibe û deriyên serdemeke nû ya dîrokî vedibin.

Ev daxuyaniya girîng a bi daxwaza "Bangewaziya Aştî û Civaka Demokratîk" a ku di 27ê Sibatê de ji aliye Abdullah Ocalan ve hatibû kirin, bi navbeynkariya Heyeta Îmraliyê jî gihîştibû civakê. Lê belê ev bangewazî, daxuyaniyeke teknîkî ya daxwaza ji bo aştiyê nîn e. Di heman demê de rasterast bi pêvajoya demokratîkbûna Tirkiyeyê ve girêdayî ye. Bi Tirkiyeyê ve têkildar e û ev yek, nexşerêyeke stratejîk a siyasî û polîtîk e.

Vê bangewaziya Birêz Abdullah Ocalan, careke din girîngiya aştiyê derxistiye pêş û rêya çareseriyê bi awayekî aşkera nîşan daye. Di bangewaziya Ocalan de tiştа herî girîng a ku raxistiye ber çavan ew e ku pirsgirêka kurd ne tenê pirsgirêka kurdan, pirsgirêka demokratîkbûna hemû gelên li ser axa Tirkiyeyê ye. Bi vî awayî nêzîkbûn, dide nîşan ku çareserî, tenê bi naskirin û pejirandina mafê kurdan na, bi veguherîna civaka demokratîk ya hemû gelên li ser axa Tirkiyeyê dijîn pêkan e. Ji xwe bi salan e fikra Abdullah Ocalan a ku derdixe pêş, a bi navê "Neteweya Demokratîk", li hemberî paradîgmaya tekparêz, pêşniyara lihevkirina civakî ya wekheviya gelan bi xwe ye.

Temsîliyeta wekhev; modela temsîlkirina wekhev a nasnameyên cuda, bawerî û çandên cuda û jiyaneke li ser hîmê azadiyê ava bûye, îfade dike. Di vê modelê de civak xwe bi rê ve dibe. Hişmendiya birêvebirineke navendî na, ya birêvebirineke herêmî derdikeve pêş. Perwerdehiya zimanê kurdî, temsîliyeta siyasî, mafên çandî û daxwaza xwebirêvebirinê ne xwestekeke kurdan tenê, ji bo hemû gelan xwesteka têkoşîna demokratîkbûnê ye. Divê ev xwestek ne tenê ji bo kurdan, ji bo hemû gelan veguhere têkoşîna azadîxweziyê.

Li pey vê bangewaziyê; ji bo dawîlêanîna têkoşîna çekdarî, PKKê kongreya xwe ya 12emîn pêk anî û ev perspektîf ber bi merheleyeke erênî ve bir. Ev biryar ji civaka westiyayî re bû bêhnvedanek, ji daxwaza gelekî ya ku ji hêviya aştiyê dûr mabû re bû moral û ji qada siyaseteke demokratîk re jî bû derbasgehekî. Ev yek, ne paşve gavavêtinek, berovajî vê yekê veguherîna têkoşîneke demokratîk, vîneke diyarker e. Êdî dema axivîn, daxwaz û guftûgoyê hatiye.

Aştî, qenciyeke ku ji bo gelan tê kirin, nîn e. Dijî vê yekê, hezkirin û vîna gelan a civakî ya ji bo jiyana hevpar a jiyîna di heman dewletê de ye. Ji ber vê yekê muxatabê aştiyê yê rasteqîn jî, yê ku ber bi encamgirtinê dibe jî, gel bi xwe ne. Bangewaziya Ocalan ji bo gelan bangewaziya avakirina şert û mercên jiyaneke hevpar a bi rûmet, wekhev û azad e. Divê tenê ne kurd, tirk bi xwe jî guh û deng bidin vê bangewaziyê. Lewra ev bangewazî, tenê, ji bo destkeftiyên Kurdan nîne. Bangewaziya hemû gelan, hemû dayikan û hemû kedkaran e. Di roja îro de berjewendiya dayikên ku dixwazin dewsa şandina leşkeriyê zarokên xwe bişînin zanîngehê, berjewendiya gelê ku ji xizaniyê bêzar bûye, berjewendiya kedkarên ku hemû barê şer ketiye ser pişta wan, di vê aştiyê de heye. Divê êdî hemû gelên Tirkiyeyê bi hev re bibin aliyê jiyîn û jiyanê, û bikaribin wêrekiya avakirina pêşerojeke dijî şer, tunehesibandin, zordariyê û bi vî awayî vîn û hezkirina xwe jî di vî milî de derxin pêş.

Helbet, aştiyeke rasteqîn li ser înkara paşerojê nema tê avakirin. Bêyî ku Roboskî bê jibîrkirin, Cizîr ji nedîtî ve bê dîtin, kavilên Sûrê bên rakirin; aştiyeke civakî ya mayînde nema tê avakirin. Lê belê hevrûbûna bi paşerojê re û vîn û îradeya avakirina pêşerojeke nû ya bi rûmet, pêkan û mimkûn e. Hevrûbûn; tenê ji bo axaftin û parvekirina bi hev re ye, ne ji bo tolhildana ji hev e. Hevdû helalkirin û bexişandin mimkun e; bes, tenê bila mirov bikaribe li ser heqîqetê hevrûyî hevdû bibe. Ev hevrûbûn tenê ji bo mayîndebûna dadmendiyê nîne, bo ewlehiya daxwaza bihevrejiyîna gelan bi xwe ye jî.

Aliyekî herî balkêş yê vê bangewaziyê jî ew e ku; gel, di vê pêvajoyê de pasîf nîne. Berovajî vê, di çareseriyê de wek çêker û kirde derdikeve pêş. Gelê Kurd, vê têkoşîna xwedîlêderketina bangewaziyê, ne tenê wek gelekî mezlûm, wek pêşeng û çêkerê aştiyê bi pêş ve dibe. Bangewaziya Ocalan; bawerîya gel a bi aştiyeke mayînde tê, girêdayîtiya wan ya bi siyaseta demokratîk û daxwaza wan ya bo jiyaneke hevpar derdixe holê.

Êdî li hemberî Tirkiyeyê du rê hene. Yan dê di şer de israr bike û bi vî awayî civakê ji hev dûr bixe, yan jî dê hezkirin û daxwazên gelan esas bigire û pêvajoya aştiyeke demokratîk bide destpêkirin. Vê gavê daxwaza gelê kurd, li ber çavan û aşkere ye. Em ji aştiyê re amade ne. Têkoşîn û keftelefta me, ji bo jiyaneke li ser xeta heqîqet, dadwerî û rûmetdariyê ye.

Aştî, ne tenê li ser maseyan, li kolan, gund û li bajaran, di navbera gelan de tê çêkirin. Ji ber vê yekê, yê ku aştiyê bide avakirin jî gel bi xwe ye. Pêşeroja vî welatî; bi tangan, copan, polîtîkayên înkar û tunehesibandinê na, bi vîn û daxwaza gelan a hevpar û li ser bingeha wekhevî û azadiyê pêkan û mimkûn e.

Û belê; di roja îro de gel ji vê aştiyê re amade ye. Yê ku bi temamî amade nîne jî, hişmendiya dewletê bi xwe ye. Lê belê, ew jî neçar e ku biguhere. Lewra êdî gel, qasî ku dê xwe bêdeng neke zana, qasî ku dê xeyalên xwe yên şikestî ji nû ve zindî bike bibiryar e.

# 'Ya em ê parçe parçe bibin ya jî bi hevre bijîn!'

Ahmet Aktaş

Ev gotinên Numan Kurtulmuş ê serokê Meclîsa Tirkiyeyê ne. Di gera xwe ya Şirnexê de, li Çiyayê Gebarê li ser cihê ku petrol jê derdikeve axivî û di encama gotara xwe ya berfireh de, ev peyvên balkêş ji devê wî derketin.

Bi hinek wezîrê xwe û 40 parlamenterên ji AKPê, MHPê, CHPê û HUDA-PARê re, di 19ê gulanê de derketibû gera Kurdistanê. Di vê gera xwe de, li gel hinek gotinên şaş û ne li gorî pêvajoyê, gelek gotinên rast û li gel pêvajoyê digoncî jî kiriye. Ka em gotinên wî yên neyînî ji wî re bihêlin, belê li ser hinek gotinên wî yên erênî, rast û balkêş, em jî hinek gotinan bêjin.

"Iraq û Sûriye parçe parçe bûn. Lubnan bê rêveberî ma, Lîbya, Sûdan, Somalî û Yemen parçe bûn. Emperyalîstan hema hemû welatên herêmê ji bo berjewendiyên xwe xistin nav şer û pevçûnan. Yan em ê jî li benda dora xwe rawestin û parçe parçe bibin, yan jî mirovên li Tirkiyeyê; Tirk û Kurd em ê werin cem hev û bi hev re bijin, vê projeya emperyalistan berovajî bikin. Em, vê rêyê ji bo xwe rast dibînin û di vê rêyê de, em ê bi pêşve biçin!"

"Armanca me û daxwaza me ya herî mezin; em vê rêyê di demeke kurt de temam bikin û ewladên vî welatî, di vê rêyê de milê xwe bidin hev û bi xwişk û biratî bi hev re bimeşin. Bêguman em jî guman dikin ku hinek wê hebin ji bo vê pêvajoyê proveke bikin, astengiyan jê re derxin û jehrdayî bixin. Di vê çarçoveyê de em ê tedbîrên xwe bigrin û êdî em Tirkiyeyek wisa avabikin da ku li tu deverê vî welatî bombe neteqin, însan bêtirs bijîn, li her deverê sitranên xwuşk û biratî û aştî werin gotin, bi hestên hevjiyanî tevbigerin" û hwd.

Helbet, heke wan peyvên bêhna nexweş jê tên û rastiyê vedişêrin nehatibana gotin, wê hîn baştir ba û dibe ku hêviya baweriyê hinek zêdetir bûya. Lê dîsa jî divê mirov van gotinan, bi giştî bêwate nebîne û ji wan zêdetir li gotinên rast xwedî derkeve, ji ber ku ji xwe em ji berê ve van gotinên rast dibêjin û bi gotineke din van gotinên hêja û rast ên me ne û lewma divê ji wan pirtir em lê xwedî derkevin, da ku em wan jî pirtir bikişînin ser rêya rast û wan li gotinan bikin xwedî.

Helbet mafê me heye ku em bi şik û guman li gotinên wan binêrin û ji gotinên wan hinek bê bawer bin.

Ji ber ku me pir durûtî û nerastî ji wan dît; hema mînaka herî şênber û nayê jibîrkirin, pêvajoya ewil a deh sal bêrê ye. Wan, ew pêvajo da rawestandin, lê Tevgera Azadiyê gunehkar nîşan dan.

Dîsa jî em hêvî bikin ku vê carê, weke cara berê nekin û dudilî nekeve mejî û bîra wan, mîna gotinên ku ew bixwe dibêjin, wisa jî li ser rêya rast, rind û qenc bimeşin.



Ji xwe divê em zanibin ku ew ne bi serê xwe û temamî bi îradeya xwe ya azad van biryaran distîne, her wiha pêvajoya yekê jî û ya niha jî wisa ye.

Ji ber ku mirov bi giranî bala xwe dide konjoktura cîhanî, dibîne ku şert û mercên heyî, siyaseta cîhanî pirtir hewcedarî pêvajoyeke wisa dike û nîşanên ku dê Dewleta Tirk vê carê ji cara berê xurtir û zêdetir hevalbendiyeke demdirêj bi PKKê re bike, ji ber ku pirtir hewcedarê Tevgêra Azadiyê ye.

Amerîka, hewldanên xwe yên dijberî Çînê, bêrawestan didomîne. Li pey gera Trump a herêmê, li Başûr bi navê hevpeymanên bazirganî yên petrol û gaza xwezayî, bi buhayê 110 milyar dolaran, rêveberiya Bexdayê bypas kir û hema yekser li gel rêveberiya Hewlêrê, şîrketên Amerîkayê girêbest îmze kirin.

Herwiha wezîrê karûbarê derve Marco Rubio, dibêje, "di demeke kurt de, li Sûriyeyê şerekî giran ê navxweyî derdikeve û rêveberiya Şamê erkê xwe temam dike, hildiweşe."

Ev daxwiyanî gelek balkêş e û tê wateya ku wê xurtir dest bavêjin rêveberiya Suriyeyê û di dewama vê destwerdanê de, dibe ku hêz û erka Rojava berfirehtir bibe.

Di encama van pêşhateyan de guman xurtir dibe ku peywendiyên Rojava û Başûr xurtir bibe, rola wê jî berfirehtir bibe.

Li aliyê din nexweşiyên navbera Hindistan û Pakistanê jî li ser mijara pirsgrêkên Keşmîrê mezintir dibin.

Tê gotin ku Hindistan, ji Tirkiyeyê gelekî hêrs bûye; ji ber têkilî û piştgiriya Tirkiyeyê ji bo Pakistanê. Guman heye ku peywendiya Tirkiyeyê li gel Rêxistina Leşker-i Teyyibe heye (nav jî dişibe navê Receb Teyib).

Van bûyeran, têkiliyê xwe bi projeya li dijî Îranê re heye, yek ji aliyê vê projeyê ew e ku, dorpêçê li welatên derdorê Îranê xurtir bikin.

Herwiha bi vî awayî dixwazin Tirkiyeyê, hîn pirtir neçar û hewcedar bikin da ku bi wan re li dijî Îranê hîn xurtir bikeve nava tevgerê. Bêguman, van pêşhateyên lezgîn ên nû, Tevgera Azadiya Kurdistanê jî hîn pirtir dixe nava amadekariyên xurtir ên ji bo hewcedariyên nûjen.

# Wayûbirayîya huqûqî

**Komelê Tirkîya û Kurdîstanî êdî paweno ke heme dînamîkî qanûnê bingeyî yê neweyî virazê û cuyêka newe bêro awankerdene. Têna hemwelatîya têduşte eşkena nê welatî bixelesno û ameyoxêkê azadî garantî bikero**

Merkezê Xeberan

Çend rojan verî Heyetê Îmrali reyna şî girawa Îmrali û Serekê PKK'yî Abdullah Ocalanî reyde pêvînayîşêk kerd. Ocalanî dîyar kerd ke zemînê huqûqî de komel hewcedarê peymanêka newe ya komelkî yo. Ey vat ke wa wayûbirayîya tirk û kurdan a ke verê cû xeripîyaye, newe ra bêro awankerdene. Mîyanê se serran de têkilîyanê wirdî şaran zerarêko pîl dî. Tîya de mesuldarîya îdarekaranê dewlete est bîye. Seke zanîyeno serranê verênan ê ronîyayîşê Komara Tirkîya de vera kurdan dişmenîye, bêedaletîye, bêhuqûqîye û nijadperestîye dest pêkerd. Seba ke mîyanê şaran de hemwelatîya têduşte nêbo, îdarekaranê dewlete her tewr metod xebitna.

Armancê serdestan awankerdişê netewe-dewlete bîye, la sifte no armanc amebî nimitene û vera kurdan "dafike" virazîyaye. Mavajê serekê Têgêrayîşê Anatolîya yan bi nameyê "Şerê Xelase" mîyanê serranê 1919-1923an de kurdan rê xeylêk wadî dabî. Înan ra yew Tamîmê Amasya yo ke hetê Hukmatê Stenbolî û Heyet-î Temsîlîye ra ame îmzekerdene bî. Nê tamîmî de ma vînenê ke derheqê kurdan de nusîyeno ke "seba xurtbîyayîşê kurdan ê azadîyane ganî qerarê huqûqî bigêrîyê". Dideyin, 1921 de qanûno bingeyî yo demokratîk virazîya û goreyê maddeya 11. ya nê qanûnî welatê kurdan de vîlayetî wayîrê otonomî benê. Hîrêyin Îzmît de kombîyayîşêkê çapemenîye de Mustafa Kemalî ard ziwan ke "ganî kurdî vîlayetanê otonoman de xo sey otonom îdare bikerê".



**Peymana Lozanî û Mîsak-i Mîllî**

Dem bi dem eşkera bî ke zerreyê wadanê Mustafa Kemalî veng bî. Ey taktîk kerd û armancê xo yo "pîl" westayane nimit. Gama ke 24ê temmuza 1923yî de Peymana Lozanî ameye îmzekerdene, ma vînenê ke erdê Kurdîstanî mîyanê dewletanê Tirkîya, Iraq û Sûrîye de ame parekerdene û Mîsak-î Mîllî ame binpaykerdene. Bi kilmî serdestanê tirkan wadê xo nêtepiştî û vera kurdan dafike organîze kerde. Ziwan, nasname û kamîya kurdan ameyî înkarkerdene.

**Komara demokratîke**

Polîtîkaya înkar û îmha badê cû bi Qanûnê Bingeyî yê 1924î û Planê Islahatî yê Şerqî domîyaye. Bingeyê netewe-dewlete erzîyayî. Hemverê estbîyayîşê şarê kurdî polîtîkaya tenkîl, tedîp û temdînî dest pêkerd. Na çarçewa de netewe-dewlete xeylêk qirkerdişî viraştî û kurdî dayî "gîyotînan" ver. Mustafa Kemalî serra 1928î de vatêne ke "komare kesêkê merdimanê bêkesan o". Komare kurdî bêkes veradayî û dima dayî bombayan ver. Yanî kurdan komare ra çi feyde û xêr nêdî. Bi kilmî serranê verênan ê ronîyayîşê Komara Tirkîya de gojagê îşligî xelet erzîyabî. Komare est bîye, la demokrasî çin bî. Nika dem demê sazkerdişê komara demokratîk o. No zî girêdayîyê qanûnê bingeyî yê neweyî yo. Komel êdî hewcedarê qanûnê bingeyî yê demokratîk û azadîwazî yo.

Heta nika 5 qanûnê bingeyî virazîyayî. Pêronan de vera kurdan, şar û bawerîyanê bînan cîyakerîye ameye sîstematîzekerdene. Komel êdî pergalêkê demokratîkî wazeno.


# Kovara Hawarî û kurdkî



Mamoste Silêman

Cuya şaran de, tayê roj û roşanê taybetî est î. Nê rojan ra tayê rojî, rojê roşanê dînî, tayê zî yê netewî yî. Semedo ke 15ê Gulane roja vetişî yê kovara Hawarî ya, na roje sey Roja Roşanê kurdkî ameya qebulkerdiş.

Sîyasetkar, roşnvîr û nuştoxê kurdanê ke sirgûn bîyê; semedo ke no ziwan û kulturo (çando) qedîm vînî nêbo û wardo lingan ser, warê kurdkî û edebîyatê kurdkî de, xebatêka erjaye kerda. No semed ra Celadet Alî Bedirxan zî 15ê Gulana 1932yî de kovara Hawarî vejeno. Tarîxê ziwan û edebîyatê kurdan de, cayê "Hawarî" cayêko mustesna yo. Celadet Bedirxanî vera polîtîkaya înkar û îmhayî nameyê na kovare sey "Hawar" panayo. "Hawar" vera polîtîkaya asîmîlasyonî yew hawara kurdkî ya.



Celadet Alî Bedirxan û embazê xo Hawar de, zafê ey netewbîyayîş û şuxulnayîşê (karardişê) ziwanê ser o vindenê. Goreyê Celadet Bedirxanî pawitişê ziwanî, pawitişê netewî yo. Celadet Bedirxan muhîmîya ziwanî, bi nê vatişê xo ano ziwan: "Miletê bindestî estbîyayîşê xo, bi di çekan pawenî: Ay yewin dîn o, ay dîyin zî ziwan o. La eke dînê netewê bindest û serdestî yew bo, hinê çeke yew tena ya û eke ti qîmet nêdî ziwanê xo û nêşuxulnî (karnêyarî), ay wext ti bêçeke manenî." Celadet Alî Bedirxan hewnêno ke kurdî bonderê ziwanê serdestan benê û ziwanê xo zî sey ziwanê dewijan veynenê, rexneyanê giranan kurdan keno û vano ke: "Kurdno malxirabno! Kuro eyb o, şerm o, yazix o, yan bonderê ziwanê xo bibê, yan mevajê ma kurd î. Bê ziwan, kurdîtî ma rê tu nerûmet a, ma rê risîyayêka giran a."

Celadet Bedirxan, kovara Hawarî de hûmara yewine de wina (ina) vano: "Hawar vengê zanayîşî yo. Zanayîş xo naskerdiş o.

Xo naskerdiş zî ma rê rayîrê xelisîyayîş û bextîyarî akeno.

Her kesêko xo nas keno; şîyno xo bido naskerdiş.

Hawara ma, verê heme çîy, ko estbîyayîşê ziwanê ma bido naskerdiş.

No semed ra ziwan; şertê estbîyayîşî yo yewin o."

Raya ewilî ya ke, yew kovare bi temamî kurdkî çap bena. Kovara Hawarî bi kurmanckî, sorankî û kirmanckî nusîyaynî. Hawar yew ekol bî. Na kovare de Celadet Alî Bedirxan, Kamûran Bedirxan, Osman Sebrî, Nûreddîn Zaza, Cegerxwîn, sewbîna roşnvîr û nuştoxanê namdaran nuştnî. Kovara Hawarî seba resayîşê nuştoxanê kurdkî û standardîzekerdişê kurdkî de rolê xo kay kerdo.

***Kovara Hawarî kurdkî rê yew xizmeto pîl kerdo.***

1-Celadet Alî Bedirxanî bi herfanê latînkîyan yew alfabe zî hedre kerde. Na alfabe raya ewilî "Hawar" de ameya şuxulnayîş.

2-Ay wext zî kurdî hetê tirkan, ereban û farisan ra asîmîle bîynê. Hawar semedo ke nasname, ziwan û kulturê kurdan biciwîyo û aver şêro yew xizmeto pîl kerdo.

3- Hawar semedo ke kurdî bonderê wendişî bibê, kurdkî biwanê, binusê û kurdkî warê edebîyatî de aver şêro, yew rolo muhîm kay kerdo. No xusus de, kurdî hêşyar kerdê.

4- Na kovare warê nuştiş û wendişê kurdkî de, kurdî bi taybetî roşnvîrê kurdan hîşyar kerdê. Yanê no xusus de yew zemên hedre kerdo.

5-Kovara Hawarî bi kurmanckî, sorankî û kirmanckî nusîyaya. Yanî kovara Hawarî semedo ke heme lehçeyê kurdkî bêrê şuxulnayîş/xebitnayîş û aver şêrê, kurdî hêşyar kerdê.

Hawar tena yew kovare nîya, semedo ke yew ziwan û kulturêko modern zîl bido û no ziwan û kultur bipawîyo yew gureyo tarîxî kerdo.

# Bezîrganîya bêlojine



Ehmedê Bira

Kurdî bi se serrano ke Osmanîyan ra, bi hezar serrano zî verî Osmanîyan xoverdayîşê merdiş û cuyayîşî danê. Se serrîyo ke zî bi zilmê tirkan, farisan û ereban reyde xoverdayîş kenê. Ewropa û DYA (Dewletê Yewbîyayeyî yê Amerîka) kurdî xora zey bazarêko bêlojin vînayê û bi dijminîya kurdan reyde kurdan ser o bezîrganîya xo kerde û kenê.

Kurdan her xoverdayîş de bi can û malê xo zirar kerdê û zirar dayê dijminan. Rîyê erdî yê dinya de çi netewe çîn a ke hintayê kurdan zilm û zordarîye bivîno. Kurdî her çiqas veyşan û teyşan mendê û rastê qirkerdiş û merdişan amebî zî nêqedîyayî. Zey nimûne kurdî zey qimilo ke xileyî wenê nêqedîyayî û nêqedîyenê.

Tarîx ra heta ney demî kurdî çiqas şidîyayî û bîyî warê tecrûbeyan, enerjîyê înan zey ûranyûmî zêdîyayo û ver bi kesanê ke dijminateya kurdan kerdê de zey koyêko asê û heybet ters dayê mezgê dijminan. Ne dijminan dijminateya xo ra fek verada, ne zî kurdan xoverdayîşê xo ra qelsîye kerde.

Nê rojê ke ma tira ravêrenê de zî, kurdî semedo ke aştî û aramî bidê xo û dormeyê xo, bi heme kiştan ra cigeyrayîş û xoverdayîşan de yê. Kiştê ra azadîya rayberê xo Abdullah Ocalanî û giroteyanê zîndanan, kiştê ra zî semedo ke Tirkîya waştişê kurdan bi qanûn bido cigeyrayîşan mîyan de yê.

Hinî eyseno ke lingeyêka TC'yî şer de, linga bîne zî zey waştişê aştî eyseno de menda. Hewna nêzana ke çi çî bikero. Çimkî se serrî yo ke bê polîtîkaya şer û qirkerdişî polîtîkaya weşî û geşî awan nêkerda. Heme emberîyanê xo de dijminateyî qise kerdo û domanê ke Tirkîya de cuyenê zî cîranê sînorê xo zey dijmino xozayî dayo şinasyayîş. Ongo rewşa fekciraveradayîşî do zaf zehmet û bi dejan bibo eyseno. No tablo, eke Tirkîya biwazo aştî û aramî bêro yo. Kişta bîne de eke senaryo wina nêbo, şer pêrodayîş verî ra xedar û xirabin do ravêro. Çimkî dewletê bîyanijî rayêko bîn do bezîrganîya bêlojine dekerê rojeve û kurdan ser o bi hawayêko takas ango rotişê malê xo bikerê. No zî polîtîkaya bîyanijan a.

Belê lazimo ke kurdî nê rojan zaf zaf haydarê xo bibê ke Kurdîstanî yew perçe awan bikerê. Lazimo ke çahar perçeyê kurdan yew xelekî dorme de kom bibê ke tarîx de çongê ci meyêrê erdî û nêdejê.

Aştî karêko zehmet o. Aştî cinawirêkê şerî ra veşî bi jahr a. Biratîya bi heq û edalet qanika fekê sîyasetmedaran ra nêkûro ke Konfederalîzmê Kurdîstanî awan bibo.





# Kurdîstan de koçberîye

Kurdîstan de koçberîye Hemkarîya Anonîme ya Petrolanê Tirkîya (TPAO) û şîrketa bi nameyê TPÎC 5 serranê peyênan de qezayanê Hezro, Farqîn, Licê û Pasûrî yê Amedî de gêrenê petrolî. Şîrketa Licê û Pasûr de seba karê sondajî darî birnayî, rayîrî viraştî.

Şîrkete nika zî çim verdayo meraya dewijan û hewteyê vîyarteyî de dewa Bilyasa Jore ya Licê de dest pê karê sondajî kerd. Dewijan şîrkete hişyar kerd û vat ke eke şîrkete wina dewam bikero, ê do dewa abikerê. Dewijan ra Ahmet Fîdanî ANF'yî rê qisey kerd û dîyar kerd ke dewe warê mera yo û karê sondajî çimeyê înan ê debare çin keno. Fîdanî da zanayene ke karê sondajî nêzdîyê dewe de yenê kerdene, ê bi vengê makînayan şîyar benê û vat: "Wexto ke ez vejîyaya teber mi dî ke temamîya binê koyî de makînayê sondajî est ê. Deşte ra heta binê koyî xeylê bîrê sondajî ameyê akerdene, dormeyê înan zî bi betonî gêrîyayo. No ca meraya heywananê ma ya. Eke no ca bêro çimkerdene, çimeyê debare û warê cuye do biqedê. Eke ma nêeşkê heywankarîye bikerê ma do neçare bimanê ke koç bikerê."

Ahmet Fîdanî îfade kerd ke nê karê şîrkete wextêkê dergî ra nata dewam kenê, bi cigêrayîşê petrolî û madenî zêdîyayê û vat: "Ma wazenê dewe ra koç bikerê. Ma tîya de dadîya xo ra bîyê û wazenê tîya de biciwîyê. Se beno wa bibo ma do dewa xo nêteriknê. Erdê ma pêşkêşê sermaye yeno kerdene. Erdê ma cara talan bîyo, hinî ganî no talan bêro vindarnayene." Şarê Şirnexî ra protesto Platformê Ekolojî yê Şirnexî talanê vera herêmanê Gabar, Cûdî û Besta yê Şirnexî protesto kerd. Dezgehanê komelê sîvîlî, DEM Partî û DBP'yî zî paştî daye eşkerayîya ke merkezê şaristanî de ameye kerdene. Şarê ke pankartê "estbîyayîşê xoza nasnameyê ma yo" akerd, slogana "Bijî berxwedana Cûdî" vate.

Vervatoxê Têgêrayîşê Ekolojî yê Mezopotamya Adnan Senbayramî vist vîrî ke 2018î ra nata Şirnex de darî yenê birnayene û vat: "Xozaya Şirnexî yena çînkerdene. Aştîye bi qedînayîşê talanê vera xoza bena." Hetkarê Hemserekanê Pêroyî yê DBP'yî Huseyîn Bîrlîkî zî talanê vera xoza sey şîdetê vera şarî hesibna û wina vat: "Ma nê qebul nêkenê. Eke aştîye bena, gerek talanê vera xoza bêro vindarnayene. Ma veng danê dezgehanê eleqedaran ê dewlete ke wa nê qirkerdişî vindarnê. PKK'yî xo fes kerd. Wa hinî asayîşî bahane mekerê. Aştîye bi xoza dest pê kena, bi Cûdî û Gabarî dest pê kena."




# Tiştanok

Gelî hêjayan; mamik an jî tiştanok çandeke kevnar a gelê Kurd e ku berê di civat û şevbêrkên xwe de ji hev dipirsîn. Me dîsa ji we re çend tiştanokên xweş amade kirine. Em hêvî dikin ku bi dilê we bin.

***1-Cêwîne li kêlek in***
Ne goşt in, lê nermik in
Dengan kom dikin
Ew çi ye?

***2- Ji goşt û hestî ye***
Pênc şax û bi destî ye
Sed û yek huner lê ye
De bêje ew çi ye?



***Bersivên me ev in:***
**1-** Guh **2-** Tilî û dest

# Dîlên azadiyê

**Hesen Hemkê**

Hevalê Hêjar piştî 30 salan ji zindanê derket û hat mala xwe.

Çend rojan li ser hev xizim, heval û hogir hatin serdana wî. Hêjar gelekî aciz bû û ji malbata xwe re got îro çend roj ez ji zindanê derketime min derve nedîtiye. Ez biçim derve ji dikanê tiştekî bînim.

Birayê wî jê re dibêje dikan mikan nemane Hêjar, market heye biçe marketê.

Hinek pere dixin bêrîka wî û Hêjar dibêje ez ê tenê herim, bila kesek bi min re neyê.


Diçe marketê û bala xwe dide kesên li wir ka çawa dikin. Ew jî çend tiştan hildigire û dikeve dorê.

Dema dora Hêjar tê û dike ku pereyan bide kasiyer, ji ber ku pereyan nas nake hema çi di bêrîka wî de heye dide destê kasiyer û dibêje heqê xwe jê bigire.

Kasiyer dibêje qey tu biyanî yî, ji kîjan welatî hatiyî. Hêjar dibêje qet nepirse hema pereyên te çiqas dike pereyê xwe bigire. Mixabin bi hezaran welatparêzên Kurd ewqas salên dûr û dirêj dîl hatine girtin, lewre haya wan ji gelek guhertinên di jiyana mirovan de çêbûne tune ye. Bi hêviya ku di demeke nêz de hemû hevalên di zindanan de serbest û azad bibin.



# XAÇEPIRS




## JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ VE

**3-** Ne hişk, şîn **5-** Xwarina sewalan **7-** Pêş **8-** Daçekek **9-** Bîr, hişmend **13-** Gulî
**14-** Bersiva erênî **16-** Tevger **19-** Rêber **20-** Reşahiya mirov û tiştan a li ber ronahiyê
**21-** Kinc **22-** Çala avê **25-** Paşdaçekek **26-** Genimê şîn **28-** Bijîjk, doktor

## JI JOR BER BI JÊR VE

**1-**Resam, xêzkar
**2-** Reqisa olî
**3-** Hewcedariya bi avê
**4-** Dohn
**6-** Jêkirin, qutkirin
**10-** Cureyekî zêd ku xwarinên cur bi cur jê tên çêkirin
**11-** Bapîr
**12-** Danekî rojê
**15-** Oleke kevnar a kurdan
**17-** Erdê çandiniyê
**18-** Berevajî teng
**20-** Bê dê û bav
**23-** Amûreke şer ê kevnar
**24-** Ne zuha
**27-** Gihanekek

## Bersiva hefteya borî





Dildarê Amedê

# Teşqeleyên ciwanan

Ciwanên 15-16 salî herî zêde delaliyên xwe li dayikên xwe dikin.

Her wiha dilên dayikan ê nazik û bi şewat ji bo armancên xwe bikar tînin.

Sero jî wekî gelek kesan di xortaniya xwe de delaliyên xwe li dayika xwe dikir.

Diya wî çi xwarin dida ber Sero, Sero dikir çinevin û lêvên xwe dirêj dikir, bi xwarinan qayil nedibû.

Çi ji diya xwe dixwest, dayika wî ne bi dilê wê be jî bi ya Sero dikir.

Piraniya ciwanên 15-16 salî çi ji dayika xwe bixwazin dayikan mecbûr dikin ku hemû daxwazên wan qebûl bikin.

Hinek dibêjin tu filan tiştî ji min re nekirî ez ê ji malê birevim û herim cihekî ku kes ji we nema min bibînin.

Hinek dibêjin hûn telefoneke destan a herî buha ji min re nekirin ez ê intihar bikim.

Welhasilî her ciwanek li gorî daxwazên xwe bi gef û hîleyan nazdarî û dilşewatiya dilê dayikan ji bo daxwaz û berjewendiyên xwe bikar tîne.

Li ba me Kurdan jî ciwan tevî van hemû rêbazên tirsandina dayikan serî li rêbaza ‘heke tu ji min re filan tiştî nekî ez ê herim çiyê’ didin.

Sero jî yek ji wan ciwanan bû ku bi vê rêbaza xwe her tiştê xwe bi dayika xwe dida qebûl kirin.

Rojekê dîsa bavê Sero hat malê dît ku dayika Sero hêsiran dibarîne.

Bavê Sero ji hevjîna xwe pirsî û got xêre dîsa çi bela Sero ye.

Dayika wî got, bi şîvê qayil nabe, ez çi didimê dibêje ez naxwim.

Bavê Sero got tamam, dest jê berde heyran, naxwe naxwe, tu çima ewqasî didî pey wî.

Dayikê bi îşaretan ji bavê Sero re got, hiş be bila dengê te neçê, dê ji malê biçe.

Bavê Sero got ka were meseleya wî ji min re bêje.

Dayikê bi çavekî tijî hêsir got, Sero dibêje hun bi ya min nekin ez ê biçim çiyê.

Bavê Sero got tamam dermanê wî li ba min e.

Bavê Sero gazî wî kir û jê re got,

Sero min bihîst ku tu dixwazî biçî çiyê. Ser çavan, bi soz û peyman heke tu vê ezmûnê derbas bikî ez ê bi destê xwe te bibim heta serê çiyan û teslîmî hevalan bikim.

Sero bi awayekî matmayî, ji bavê xwe pirsî û got ezmûna çi tu çi dibêjî ez fêm nakim.

Demsal zivistan e û hinek berf jî li erdê heye.

Bavê Sero jê re got; kurê min ê qehreman, ez heyrana wan çavên te yên mêrxas bim. Heke tu vê ezmûnê derbas bikî wê serê min ji ber te bilind be û ez ê te bighînim mirazê te.

Sero got de ka bêje ezmûna te çi ye?

Bavê Sero betaniyek da destê Sero û got de rabe kurê min em biçin ser banê xanî, heke tu Îşev heta serê sibehê karibî le ser banî bimînî, bi soz ez ê te bibim teslîmî hevalan bikim.

Bû çinevina Sero lê bavê wî guh nedayê, bi destê wî girt ew bir ser ban û deriyê ban lê girt.

Lê Seroyê me ne heta serê sibehê, heta 10 deqeyan xwe li ber wê sermayê negirt û bû hewar û gaziya wî bang li diya xwe kir.

Diya Sero bi zorê bavê wî qayil kir ku derî lê veke û were hundirê malê.

Bavê Sero jê re got min zanibû ku tu ne ew mirovê wêrekî, loma min ev ezmûn ji te re çêkir.

Heke min zanibûya tuyê biçî serê me bilind bikî, min ê tu bi dahol û zirneyê bişandayî. Lê ez dizanim ku qûna te ne ew qûne Sero.

Ji wê rojê pê de êdî Sero çi dihat ber dixwar û tu wateya wê gefa ku li diya xwe dixwar nemabû.

Bi giştî ciwan di vî temenî de gelekî bêcir dibin û dixwazin her tiştî biceribînin. Di wan ceribandinên xwe de herî zêde teqlîda mezinên xwe dikin. Di wî temenî de ew bavê ku di çavên zarokan de her tiştî dizane êdî namîne. Lewre di wî temenî de peywîra herî mezin û ezmûna herî dijwar a dê û bavan e.



Rohat Bulut

# Ji hunermendên kurd re mîrateyeke hêja hişt

Rista ji hunermendan ji bo civakên wan girîng e. Kêm hunermend hene ku li gorî rist û bendewariyên civaka xwe tevdigerin. Hunermend Tehsîn Taha jî yek ji wan hunermendan e ku bi têkoşîn, xebat û hunera xwe mîrateyeke giranbuha ji civaka Kurd re hiştiye. Bi taybetî jî bi stranên xwe, cih û textekî bilind di dilê civaka xwe de afirandiye. Bêguman wekî her hunermendê li ser doza têkoşîna civaka xwe gelekî êş kêşandiye û bedel daye. Tehsîn Taha di 25ê Gulana 1941ê de li bajarê Amêdîyê yê başûrê Kurdîstanê ji dayik dibe. Perwerdeya xwe li Mûsil û Bexdayê dibîne. Ji ber karê bavê xwe, bi malbatî bajar bi bajar geriyane.

Tehsîn Taha di temenê xwe yê biçûk de muzîkê nas dike. Di bin bandora M. Arîf Cizrewî û Hesen Cizrewî de dimîne. Cara yekemîn di sala 1958an de li Radyoya Bexdayê di beşa Kurdî de dest bi xebatê dike û stranan dibêje. Hunermend di temenê xwe yê ciwan de di nav civaka Kurd de tê nasîn. Hunermend Tehsîn Taha piştî qedandina zaningehê jî wekî mamosteyê muzîkê xebatên xwe didomîn e. Di civaka Kurd de her hunrmend, rewşenbîr, nivîskar, dengbêj û stranbêj li gel pêşandana hunerên xwe bi êşa neteweya Kurd re jî radibin. Ji bo azadiya civakê li aliyekî bi hunera xwe gel hişyar dikin li aliyê din jî bi xwe tev li têkoşîna azadiya civaka Kurd û Kurdistanê dibin. Li gel hunermendiyê dil û heşê Tehsîn Teha li ser azadiya Kurdistan û neteweya kurd bû. Di sala 1961an de jî diçe Zaxoyê û tevli Şoreşa Kurdistanê dibe. Di navîna salên 60î de ji aliyê rejîma Iraqê ve tê girtin û nêzikî 2 salan girtî dimîne.

**Tehsîn Taha bi giştî 8 albuman derdixe û herî zêde bi strana "Ey Felek" jî di nav de bi stranên xwe yên navdar yên mîna "Bêrîvanê" û "Rabe Cotyar" tê nasîn. Hurnermend Taha mîrateyeke hêja ji dengbêj, hunermend û stranbêjên kurd re hiştiye**



**Ji bo çi strana Ey Felek?**

Di sala 1970 de hunermend careke din dizivire Bexdayê û di radyoyê de dest bi kar dike. Hunermend Taha di stranên xwe de qala evîn, hezkirin û welaparêziyê dike. Di sala 1975an de, dema ku tevgera Mele Mustafa Barzanî li dijî rejîma Iraqê têk diçe, Taha strana "Ey Felek" dinivîse û hestên xwe tîne ziman. Hunermend Tehsîn Taha bi hunermendên mîna; Eyşe Şan, Seîd Gabarî, Gulbihar, Salîm Helebî, Erdewan Zaxoyî, Elbirt Nayîl û gelek hunermendên Kurd re tev digere, stranan dibêje. Êdî li her derê nav û dengê wî belav dibe û tê hezkirin.

**Xwedî taybetmendiyeke girîng bû**

Tehsîn Taha bi giştî 8 albuman derdixe. Hunermend herî zêde bi strana "Ey Felek" jî di nav de bi stranên xwe yên navdar yên mîna "Bêrîvanê" û "Rabe Cotyar" tê nasîn. Hurnermend Taha mîrateyeke hêja ji dengbêj, hunermend û stranbêjên Kurd re hiştiye. Bi muzîk û şîroveya xwe xwedî taybetmendiyeke girîng û cihekî taybet û cuda ye.

Hunermend Tehsîn Taha, heta mirina xwe bi dehan stranên ku ji ser zimanan neketin afirand û wekî mîrateyeke giranbuha li dû xwe hişt. Gula Min Werîya, Bi Tenê, Çav Belek, Amedîkê Bilind e, Bûka Behdîna, Rabe Cotyar, Dilêrên Welatî, Dîlberê, Evîndar im, Bêrîvanê, Xalxalokê, Şekir Barî, Erê An Na, Pismamo, Cîranê, Eman Eman, Aso, Rewşena Malê, Xwîna Dilan, Derdo, Were Canê, Yarî Dilo, Wele Şî Nakim, Min Bidinê hin ji stranên ku Tehsîn Taha gotine ne.

**Dixwest şerê "Birakujî" bi dawî bibe**

Hunermend Taha di destpêka salên 90î de diçe Ewropayê. Li vir başdarî gelek şev û şahiyan dibe. Tehsîn Taha qet ne alîgirê rêxistin û partiyekê bû. Ji xwe ji ber aciziya şerê "Birakujî" li Hollandayê bi cih dibe. Her armanc dike ku ev şerê "Birakujî" bi dawî bibe, tifaqa Kurdan pêş bikeve û yekitiyek avabibe. Lê temenê wî têrê nake. Tehsîn Taha di 13ê Adara 1994an de ji ber nexweşiya ku lê peyda dibe li Hollandayê diçe nexweşxaneyê û demekê tedavî dibîne. Lê belê di 28ê Gulana 1995an de li nexweşxaneya ku tê dermankirin jiyana xwe ji dest dide. Hunermend Tehsîn Taha li bajarê Amediyê tê definkirin.

Bi minasebeta salvegera koça dawî ya Hunermend Tehsîn Taha em wî bi bîr tînin û careke din bi vê mebestê em bi bîra xwînerên xwe dixin.

Nezir Ocek

# Jin û rola wê ya di çanda kurdan de











Bêguman bi wayekî şênber tê dîtin, ku nêrîna li jiyan, xweza û her herêma ku bi mirovan hatine avedankirin; di hemû quncikên vê erdnîgariyê de gelek, gel û komên civakî yên cur be cur hene; îcar ên ku ziman, deng û rengên wan jî ji hev cudane hene. Di nav hemû gelan de jî, hizirîn, raman û nêrînên ji hev cihê hene, lê bi şêweyekî wêneyê cîhan û mirovan, ne mîna hev in û wekî hev jî nayên dîtin, lewre her yek ji wan bi têleke pêşiyên xwe ve hatine girêdan, jiyana xwe derbas kirine. Ew dab û nêrînên ku ji bavkalên wan gihiştiye destê wan, bi vê jî nêzîkatiya wan a rojane diyar dibe, jixwe her ev e ku di hizirkirin û rewişta (karekter) wan de reng vedide. Anku di hemû dem û serdeman de, ew çand, dêlindîz û şopên raboriyê bûye sedem ku rola mirovan di nav civakê de, tê diyarkirin.

Bi taybet nirxandina li ser keç û jinan, ji dêrîn ve heta roja îroyîn jî, bi heman rê û rêbazê rûdaye, çêbûye. Bêguman gelek gel û netewe hene, ku rol dane keç û jinên xwe û jiyana wan azad hiştine daku keç û jinên wan bikaribin bi awayekî azad xizmeta gel û welatê xwe bikin. Lê li dijberê vê jî, gelek gel û netewe hene, ku di çanda wan de jin bênirx, kêm tê dîtin, bi vê sedemê jî, jin tê binpêkirin bê maf tê hiştin, ev rêbaz di çanda gelek gel û neteweyan de niha jî bi awayekî şênber li ber çavan tê dîtin. Bi taybet nêrîna wan gelan a der barê jinê de bi çavê bazirganî û zewqawergirtina ji bedena jinê, di cîhana kevnar û ya hevdem de jî, di bi nav û nîşanên cihê de, hê jî kara ye û berdewam e.

Li vir dixwazim çanda kurdan û ya hin gelên din di dîrokê de, ka kurdan û gelên din çi rol ji aliyê siyasî û leşkerî ve danê jinê berawirdê hev û du bikim.

Bo nimûne di sedeya şeşê berî zayînê û pêştir de jî, babîliyan, keçên xwe dibirin li nav bazaran difirotin. Lewre babîlî gelekî wisa bûn ku jin û keçên xwe qeyd û zincîr dikirin, ew mîna ajelan li bazaran dikirîn û difirotin, her wiha heta sedeya şeşê berî zayînê û pişre jî, helwest û nêrîna wan bi vî awayî li hemberî jin û keçên wan domandiye û jin û keçên xwe bêbandor, bêdesthilat, bêdeng û mîna kenîze û koleyan danûstandin firotinê li gel wan kirine. Bi rastî babîliyan çandeke pir rezîl, riswa û sosret hebû, lewre dema ku dizaniyan keçên wan mezin bûne, wextê şûkirina wan hatiye, êdî ew keç berbijêr bûne, ew dibirin li nav bazaran, devereke ku mirov lê pir bin, ew keçên gihayî û berbijêr bifiroşin.

Vêca bikir jî, li dora wan keçan dihatin û diçûn, îcar ku kesekî jî wekî simsar, bangewazker, serperiştiya firotinê girtiba ser xwe, wî bangewazkerî ji bo her keçekê, li gorî xweşikahî, bedewî, qeşengî û bal û rûdêma wê, nirxekî cuda ji bo wê raberê bikiran dikir.

Îcar hê beriya zayînê di sedsala 9emîn de û pêştir de jî, keç û jinên kurd mil bi milê mêran heta mirinê, ji bo ax û welatê xwe şer û ceng dikirin, di dema şer û cengê de jî, keleha piştê ya mêran bûn û her yek ji wan, heta di rola leşkerî de digihiştine radeya generaltiyê jî. Bêguman di wê serdemê de jî, keç û jinên kurdan di civakê de giraniya wan hebû, mil bi milê mêran dixebitîn, şerker û cengawer bûn û xizmeta wlatê xwe dikirin.

Mêrên kurd, li gorî xweza wan jin, li nik wan pîroz û bi rûmet bûye û di hemû dem û serdeman de jî, jinê pêgeha xwe hebûye, tu wextî kesekî nikariye wê kêm bibîne. Her wiha jina kurd li kêleka xwedayan, xwedawend bûye. Bo nimûne Hêpata hevjîna xweda Teşuba xwedawenda rojê bûye, ku ev jî têgiştina bilind a kurdan derdixe holê û di hemû dem û serdeman de, cihê taybet ji bo jina kurd hatiye dabînkirin. Îcar hebûna wan ya di pêgeha xwedawendiyê de, heta wek leşker û general jî her wekî pêwîstî hebûye. Aha her ji ber vê bû; ku asûrî bi qasî mêran, ji jinên kurdan jî ditirsiyan. Asûriyan, bi vê têgihiştina ku ew şûr, tîr û kevanên ku di destê jinên kurd de tê dîtin, wekî yên mêrên wan, ji xwe re wekî metirsî didîtin. Bi vê sedemê, dema wan êrîşê şahnişînên kurdan dikirin, bêyî ku ferq û cudahiyê bixin navbera jin û mêrên kurdan destê xwe ji keç û jinên kurdan jî nedidan paş û li mêran ew di nav agir de dişewitandin. Bo nimûne beriya zayînê di sedsala 9emîn de, Aşûrnasîpalê duyem, ew qasî ji jîrektiya keç û jinên kurd tirsiyabû; tiştî ku bi serê mêrên kurd tanî, destê xwe ji kuştina jinan jî nedida paş.

Bêguman şewitandina keç û jinên kurd, ji wê tirsê dihat ku qiralê asûriyan bi çavê xwe didît; ku keç û jinên kurdan, li kêleka mêran şer û ceng dikin û keleh û bajarên xwe bernedidan û ji dijminan diprastin. Îcar, ew wisa ditisiyan, ku heyîn û mayîna keç û jinên kurd, ên ku di şer û cengan de mîna xortên kurdan têdikoşiyan û li ber xwe didan, ji bo desthilatî û hebûna wan a di herêmê de metirsîdar bû.

Bêguman keç û jinên kurd hem di dîrokê de hem jî di roja me ya îroyîn de, bûne xwediyê çandeke wisa ku navdariya wan li her çar aliyên cîhanê olan daye û bûne sebola berxwedaniya li hemberî hemû desthilatdarên zorbar û pergala bavilsalariyê.

xwebûn

26 Gulan- 1 Hezîran 2025 / e-mail: rojnameyaxwebun@gmail.com / Hejmar: 284

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:** Abdullah Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:** Mehmet Ali Ertaş
**Yayın Danışma Kurulu:** Abdulla Peşêw, Adar Gulan, Heval Dilbihar, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco, Munewer Azîzoglu Bazan
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli
**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mah. Kurt İsmail Paşa 2 Sk. Güneş Plaza No 18/22 **Yenişehir-Diyarbakır**
**Baskı:** Dicle Basın Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Blv. Batıkent Yapı Koop. 26/UA **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
**Tel:** 0 (541) 806 84 85

# Raywanîya ziwanê kurdkî



Cemîle Turhalli

Her milet bi ziwanê xo reyde yeno şinasnayene. Ziwan semedê şaran nasnameyêko girîng o. Şerê Dinya yê Yewinî ra pey cayê împaratorîyan dewleta netewe girewte. Semedê dewleta netewe zî ziwan wesayîtêko muhîm bi. Çunke hetê nufusê şaran ra cayêk zî homojen nêbi. Heta kulturî ra bigîrê heta bawerî, heta ziwanî ra bigîrê heta fîzîkî cuya merdimî pluralîst biye. Tena cografyayêk de nê, dewan de zî zafbawerî, zafziwanî û muxtelîfîye est bê. Wexto ke dewleta Tirkîya awan bîye, dewlete waşt ke xo tena etnîsîteyêk ser awan bikera, a etnîsîte zî etnîsîteya tirke bî. Her çiqas dewlete xo nameyê dewleta netewe ser o pênas kerdbî zî na netewe de etnîsîteya tirkan ber çi etnîsîteyî nêameyê qebulkerdene. Seba aye dewleta tirke sîstemê monîstî ser o xo awan kerdo. Îmtîyaz dayo miletê tirkî, labelê heqê hemwelatîye nêdayo şaranê bînan. Polîtîkaya monîste û îmtîyazê nasnameyê tirkî qanûnê bingeyî yê 1876î de xo eşkera keno. Maddeya nê qanûnî ya 18î de ziwano resmî tirkî ya. Semedo ke kesêk komelêkê dewlete de bieşko xebatêka resmî bikero, ganî ziwanê resmî tirkî bizano. Nê qanûnî ra pey tarîxê Komara Tirkîya de 3 qanunê bingeyî ameyê qebulkerdene. Nê qanûnanê hemînan de polîtîkaya ziwanî bi şeklêko cîyakerîye ameya îfadekerdene.

**Qanûnê Bingeyî yê 1924î de "Ziwano resmî yê dewleta Tirkîya tirkî ya". Qanûnê Bingeyî yê 1961î de "Ziwano resmî yê Komara Tirkîya tirkî ya." Qanûnê Bingeyî yê 1982yî de "Ziwanê Komara Tirkîya tirkî ya."**

Nê hîrê qanûnanê bingeyîyan de wina aseno ke dewlete game bi game polîtîkaya neteweperwerî û cîyakerîye zîyade kerdo. Çunke tarîxê nêzdî de ma vînenê ke dewlete ziwanê tirkî tena hetê fermîtî de yewin nêkerdo, ziwanê tirkî her ware de tena yew ziwan qebul kerdo. Çunke vato ke "ziwanê Komara Tirkîya tirkî ya." Wina aseno ke nê qanûnî bira tirkî ziwan, sey ziwan qebul nêkerdo. Goreyê nê sîstemî waştişê heqê ziwanê kurdkî, waştişo meşrû nîyo. Semedê dewleta xo, kurdî sey tehlukeyêko pîl vînayê. Na seserre de na mesele yan sey "Meseleya Şerqî" yan "Meseleya Rojhelatî" yan "Meseleya Başûrê Rojhelatî" yan zî sey "Meseleya Terorî" ameye pênaskerdene.

Awanbîyayîşê dewleta tirke de dewlete bi xo na mesele ser o nêfikirîyaye. Derheqê kurdan de zaf raporî ameyê amadekerdene.

***Nê raporan ra nimûneyî nê yê.***

✓ Planê Islahatî yê Şerqî
✓ Raporê Abdulhalîk Renda
✓ Raporê Cemîl Uybadinî
✓ Raporê Hamdî Begî
✓ Raporê Îbrahîm Talî Ongorenî
✓ Raporê Fevzî Çakmakî
✓ Raporê Îsmet Înonuyî
✓ Raporê Abîdîn Ozmenî
✓ Raporê CHPyî yê 1940î
✓ Raporê Gulane
✓ Raporê Rojhelatî

Nê raporan de nufusê kurdan ra bigîrê erd, eşîrê înan û cilê înan ra bigîrê derheqê bawerî û kulturê înan de zaf melumatî yenê dayene. Nê melumatî semedê şinasnayîşî ney nê raporî semedo ke ma senî miletê kurdî bikerê tirk yanî pêşnîyazê polîtîkaya asîmîlasyonî ser o vindertê. Dewleta tirke sosyolojîya kurdan ser o muhendisîya sosyale tetbîq kerdo. Nê raporan ra ver û badê cû zî nê qanûnan reyde dewlete waşto sîstemê xo ra meşrûîyet virazo. Nê qanûnî û caardişê nînan nê yê:

✓ Qanûnê Tevhîdê Tedrîsatî (1924)
✓ Qanûnê Takrîrê Sukûnî (1925)
✓ Qanûnê Alfabe (1928)
✓ Qanûnê Peynameyî (1934)
✓ Qanûnê Îskanî (1934)
✓ Akerdişê Mehkemeyanê Îstîklalî
✓ Mufettîşîyê Pêroyî
✓ Wendegehê ke gedeyî şewe tede yenê rakewtene
✓ Awanbîyayîşê Enstîtuyê Kênekan
✓ Viraştişê asinrayîran
✓ Kurdî ver bi rojawanê Tirkîya dîyayî koçkerdene
✓ Rojhelat de cakerdişê tirkan

***Mabênê 1925-1960an de nê caardîşî zî ameyî tetbîqkerdene:***

✓ Awankerdişê merkezê Tirkîya
✓ "Hemwelatî rê kampanyaya tirkî qalî bike zaf qalî bike" (1927)
✓ Camêrdanê kurdan reyde teşwîqkerdişê zewicnayîşê cinîyanê tirkan
✓ Karmendê ke sey daraxê 2. hesibîyenê, kurdnêbîyayîşê nê karmendan
✓ Karmendê ke kurdkî qalî kene, înan karmendîye ra vetiş
✓ Axa û şêxan dayîş koçkerdişê rojawanê Tirkîya
✓ Dewijê ke herra xo çin a înan rê vilakerdişê herre
✓ Dewe û mezrayê ke vilabîyaye yê înan pêranayîş
✓ Kurdê ke gîrîyayê esker û gîrîyayê xizmetanê apeyan înan rê tirkî banderkerdiş
✓ Keyeyê şaran ra hîna zaf havilegirewtiş, keyeyê ke koyan de tûk-tena yê înan xeripnayîş û wayîrê înan neqilkerdişê sewbîna cayan


HABER
16 Sayfadır
Bir kanun teklifi :
Türkçe konuşmayanlara ceza verilecek
Para cezasının yarısı ihbar edenlere mükâfat verilecek
Menemende 4000 dönüm mezru erazi sular altında
Beş nufuslu bir aile evîyle sellere kapıldı
Bakırçay ve Kınık ovalarınıda su bastı
Hava kuvvetlerimizin inkişafı için
"Hür olmıyan Almanyada işim ne ?„
Amerikanın Berlin elçisi vazifesini terketti
20 milyon dolarlık silâh
Italya yeni harp gemileri yapıyor
İspanyadan 100 bin gönüllü geri çekilecek




HAWAR
KOVARA KURDÎ • REVUE K
SIRA QURANÊ







**Nê prosesêkê neweyî de ma qebul bikerê ke metodê têkoşînî ge-ge bedilîyenê. No dem semedê ma wesayîto tewr muhîm bêguman ziwanê kurdkî yo**

✓ Komela Cigêrayîşê Ziwanê Tirkî
✓ Tevgerê Tirkîya yo Pak (1935)
✓ Teorîya Ziwanî ya Rojî
✓ Tezê Tarîxî yê Tirkan

No mojneno ke dewleta Tirkîya semedê kurdan waşt ke yew qulike veng zî nêverado. Na mesele zerreyê xo de bihelêno û kurdan bikero tirk û bi ebedî meseleya kurde orte ra wedarno.

Verba na polîtîkaya zordare kurdan xo ver dayo. Serewedaritîşê kurdan înan rê hişmendîya kurdî ya neteweyî arda. Na hîşmendîya tewr muhîme ma 1934î de kovarvetişê Mîr Celadet Elî Bedirxanî de vînenê. Nameyê na kovare Hawar o, 57 hûmarî yena weşanayene. Na kovare hemverê na polîtîkaya mergî de hetê çinbîyayîşî de sey estbîyayîş o.

**1990î ra pey**

Hetê SHP'yî ra reya verêne serra 1990î de "Raporê Başûrê Rojhelatî" de meseleya kurde ameye pênaskerdene. Nê raporî de reya verêne sebebê polîtîkayanê dewlete vera meseleya kurde xorîn ameyo îfadekerdene. Semedê çareserîye "qebulkerdişê nasnameyê kurdî, wedaritişê qedexeyê ziwanê dayîke, qanûnê bingeyî de û qanûnan de çarçewaya qaydeyê huqûqî yê demokratîkî de sey wedaritişê çend rêzan pêşnîyazî" ameyî qebulkerdene.

**1992yî ra pey**

Serekkomaro 8. Turgut Ozalî meseleya kurdan ser o çend raporî dabî amadekerdene. Gama ke rapor 2 aşmî dima resa Serekwezîr Suleyman Demirelî, ey zî Amed de yew qalîkerdişê xo de va ke; "ma realîteya kurdan şinasnenê."

Wextê hukmatê Ozalî de wezîr Adnan Kahvecîyî serra 1992yî aşma gulane de meseleya kurdan ser o raporêk amade kerd û pêşkêşê Ozalî kerd. Nê raporî de nê ameyê îfadekerdene: "Meseleya kurde bi leşkerî çareser nêbena. Ganî îradeyo sîyasî însîyatîf bigîro. Eke meseleya kurde rê teşhîsêko cîdî nêyero vînayene, do Tirkîya de herbo mîyanên bivejîyo. Her kes bêveng bimano û do Tirkîya ver bi felakete şîra. Her şehîdê eskeran ra dima do pêro kurdan rê yew nefret bivirazîyo. Eke no nefret lez nêpeysîyo, Tirkîya do tesil ver bi şerî şîra. Reyna goreyê raporî ganî realîteyê kurdan bêro naskerdene, nasnameyê kurdan, radyoyê kurdkî û TV bêrê dayene."

Helbet nê tesbît û qebulkerdişî xo bi xo nêbîyê. Bingeyê nê tesbîtan de xoverdayîşê kurdan û israrê înan est bi. Nê wextan de rayberê komelê kurdan waştişê heqanê kurdan warê pêroyî de bi şeklo bawerîye xo îfade kerdêne. Nînan ra merdimêko erjaye Vedat Aydin bi. Aydin, 28ê teşrîna verêna 1991î de heyetê pêroyî yê ÎHD'yî de tena ziwanê kurdkî qisey kerd. Dima ame tepiştene. Mehkemeya xo de bi xo ra bawer ziwanê xo pawit, cîyakerîye eşkera kerde û qebul nêkerde.

Nê dewran de Leyla Zana wexto ke sond wend, sereyê xo ra rengê kurdewarî kesk û sûr û zerd girê dabî. Sondwendişê xo ra pey bi kurdkî va "Wê sondê mi ji bo gelê Kurd û Tirk." Hatîp Dîcle zî sondê xo ra verê va "Ez û embazê xo nê sondî binê zordarîya qanûnê bingeyî de wanenê." Nê rewşan de qiseykerdişê kurdkî heme kurdan ra hişmendîyêka newe viraşte. Na hişmendîye heyecanêk û xobawerîye arde.

**2000î ra pey**

Nê dewran de ma eşkenê vajê qedexeyî binêna ameyê wedarnayene. Kasedê kurdkî, çapkerdişê kitaban, TV, radyo û propagandaya weçînayîşî ameyê serbestkerdene. La çi heyf ke nê bedilnayîşan mesele çareser nêkerde çunke problem esas cayê xo de bi. O problem zî perwerdeyê ziwanê kurdkî û warê pêroyî de qebulkerdişê ziwanê kurdkî bi. Çunke nê qanûnê bingeyî de ameyo qedexekerdene.

Meclîs de 2011-2013yî de semedê qanûnê bingeyî komîsyonêk ame ronayene. Hetê komîsyonî ra xeylê dezgehê komelkî, partîyê sîyasî, enstîtuyî, şaredarîyî û pêro pîya 401 dezgehî ameyê dawetkerdene. Fikir û ewnîyayîşê înan ameyê girewtene. Unîversîteyanê dewlete û taybetan ra zî ewnîyayîşî ameyê girewtene. Unîversîteyanê dewlete ra se ra 65, yê taybetan ra se ra 35 ewnîyayîşê xo erşawitî. Nê komîsyonî de AKP'yî de nasname ser o pêameyîşêk ame viraştene la CHP û MHP'yî de nêame viraştene. Îtîrazê MHP û CHP'yî zafane zafziwanîye ser o bîyî. Înan vat ke zafziwanîye do sey Yugoslavya dewlete lete bikero. La nimûneyê Belçîka, Îspanya, Swîs nêardê verê çimanê xo. Xo nê nimûneyan rê kerr kerdî.

Partîya HDP'yî vat ke semedê kurdan ganî heqê kêmneteweyîyan o asgarî bêro qebulkerdene. Bi destê CHP û MHP'yî ame vatene ke "kurdî na dewlete de kêmîye ney endamê dewleta netewe yê." Nê komîsyonî de bedilnayîşê qanûnê bingeyî ser o munaqeşeyan de konsensusêk nêvirazîya û dima ra Sîstemê Serekîye yê AKP'yî ra pey no proses û têhetameyîş xora qedîya.

Heta nika ziwanê kurdkî bi heskerdoxê xo û têkoşerê kurdkî reyde xoverdayîşêko nimûne dayo. Hawar bi vengdayîş da û xo resna çar hetanê Kurdîstanî ra û înan ra toxim eşt. Nê toximî vakurî ra vile da bî Tîrej, bî Azadiya welat û bî bi desan kovaranê kurdkî.

Nê prosesêkê neweyî de ma qebul bikerê ke metodê têkoşînî ge-ge bedilîyenê. No dem semedê ma wesayîto tewr muhîm bêguman ziwanê kurdkî yo. Gani cuya ma ya hemîne de ma bi ziwanê xo de eseran vejê û warê pêroyî de xebatan, heme caardişanê xo ziwanê xo de bikerê.

**Encam û çareserî**

Ma qebul bikerê ke merdimî eke ziwanê xo nas bikerê, ziwanê xo reyde xo nas kenê. Ganî mabênê ziwanan de hîyerarşî çinî bo. Ganî vernî de verê mabênê ziwanan de "aştîya ziwanan" virazîyo. Komelê ke mabenê xo aştîya ziwanan nêvirazenê, nêeşkenê yewbînan de aştî bibê. Meseleya kurdan de zî problemo tewr pîl meseleya ziwanî ya.

✓ Zafziwanîye û zafkulturîye garantîya neteweya demokratîk a.
✓ Ganî heqê xebitnayîşê ziwanî garantîyanê qanûnê bingeyî ra bipawîyo
✓ Ganî vateyê "hemwelatîye" nêyero tena manaya "yew netewe".
✓ Ganî heqê merdimîye û demokrasî pêro netewe, komelê bawerîye rê reyna serûber bibê, dewlete ganî qanûnê bingeyî de madeyanê cîyakeran (Destpêk ra heta maddeya 4., maddeyê 42, 63 û bînî) bibedilno.
✓ Xizmetê dezgehanê pêroyî de ganî ziwanê dayîke rê vernîyîye bêro dayene.
✓ Ganî herêman de tewr tay di ziwanê fermî bêrê qebulkerdene.
✓ Selahîyetê merkezî yê fermîyî ganî transferê herêmî bibê (desantralîzasyon).